



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (1), pp. 214-246

<http://www.ijoks.com>

Edebîyatê Zazakî De Pêlê Femînîzmî: Analîzê Hikayeyanê Hikayenuştoxanê Cinîyan

Pınar YILDIZ¹

Received: Jan 28, 2025

Accepted: Mar 7, 2025

Kilmvate

Edebîyatê zazakî (kirmanckî) mîyan de heme tewiranê edebîyan de hûmara nuştoxê ke cinîyî zaf tay a. Labelê bîlhesa badê serra 2011î tayê kovare û rojnemayanê zazakî de ma berhemanê nuştoxê ke cinî yê, înan vînenê. Nê berhemdayîşî mabênê çar-panc serran de bi çapbîyayîşê kitabên hikayeyan dewam kerd. Bîlhesa serranê 2012-2013 û 2014î de têdima kitabê hikayeyanê nuştoxê ke cinî yê çap bîyê. Na xebate de ma hewl da ke nê kitabên ra Bero Sûr (2012) û Menewşî (2020) ke hetê Bedriye Topaç ra; Pîyê Mi Kemane Cinitêne (2013) ke hetê Nadîre Guntaş Aldatmaza ra; Hêvîya Macire (2013) ke hetê Burçîn Bore ra; Zeman Sey Fekê Kardî Bî (Hikayeyê Koyî) (2013) ke hetê Şeyda Asmîne ra; Vîndîbîyaye (2014) ke hetê Lorîn Demîrele ra ameyê nuştene, bi ewnîyayîşêkê femînîstî analîz bikê. Ma berhemanê nê nuştoxan de dekwetê temsîliyetê cinîyan dima. Gelo mîyanê nê hikayeyan de karakterê cinîyî bi terz û ewnîyayîşêkê senînî ameyê mojnayene û temsîliyetêkê înan yo senîn esto? Berhemanê nê nuştoxanê cinîyan de, hetê babetan ra gelo ferqêk esto û nê nuştoxanê cinîyan kamcîn hetê cinîyan û cûya înan mojnayo ra? Nê hikayeyan de sey karakter gelo cinîyî wayîrê temsîliyetêkê senînî yê? Norm û rolanê komelkîyan nê nuştoxanê cinîyan û karakteranê înan yê cinîyan ser o senîn tesîr kerdo? Na xebate de derûdormeyê nê persan de ma hewl da ke nê berheman analîz bikê û nê persan rê cewaban bigeyrê.

Kilîçekuyî: Femînîzm, edebîyatê zazakî de nuştoxê cinîyî, edebîyatê zazakî de hikayeyî, Nadîre Guntaş Aldatmaz, Bedriye Topaç, Burçîn Bor, Lorîn Demîrel, Şeyda Asmîn

Recommended citation:

Yıldız, P. (2025). Edebîyatê Zazakî De Pêlê Femînîzmî: Analîzê Hikayeyanê Hikayenuştoxanê Cinîyan. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 214-246,

DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1628630>

¹ Dr., Res. Assist., Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye: pinaryildiz@artuklu.edu.tr

ORCID: <https://orcid.org/0000-0002-8175-0879>

The Wave of Feminism in Zazaki Literature: Analysis of Stories by Women Storytellers

Abstract

In Zazaki (Kirmanckî) literature, the number of female writers in literary genres is quite low. However, especially after 2011, we see works by female writers in some Zazaki magazines and newspapers. This situation continues into the next four to five years with the publication of story books. Especially in 2012-2013 and 2014, story books by female writers appear in abundance. In this study, these books are “Bero Sûr” (2012) and “Menewşî” (2020) written by Bedriye Topaç; “Pîyê Mi Kemane Cinitêne” (2013) written by Nadire Guntaş Aldatmaz; “Hêvîya Macire” (2013) written by Burçin Bor; “Zeman Sey Fekê Kardî Bî (Hikayeyê Koyî)” (2013) written by Şeyda Asmin; and “Vîndîbîyaye” (2014) written by Lorin Demirel has been analyzed from a feminist perspective. We have tried to trace the representation of women in these works in respect to the style and perspective of female characters presented and in general the representation they have. We examine whether or not these female writers have any distinctive features in terms of subject and theme and in which sections of women’s lives they show in their works. This study seeks to analyze issues such as the nature of representation and gender norms and what roles affect these female storytellers and their female story heroes.

Keywords: Female writers of Zazaki literature, story books in Zazaki, female writers in Zazaki such as: Nadire Guntaş Aldatmaz, Bedriye Topaç, Burçin Bor, Lorin Demirel, Şeyda Asmin, Zazaki magazines and newspapers

Zazaki Edebiyatında Feminizm Dalgası: Kadın Hikâye Anlatıcılarının Hikâyelerinin Analizi

Özet

Zazaki (Kirmanckî) edebiyatında bütün edebi türlerde kadın yazarların sayısı oldukça azdır. Fakat özellikle 2011 yılından sonra Zazaca yayımlanan bazı dergi ve gazetelerde kadın yazarların eserlerine rastlıyoruz. Özellikle 2012-2013 ve 2014 yıllarında kadın yazarların öykü kitapları peş peşe yayımlanmıştır. Bu çalışmada Bedriye Topaç’ın “Bero Sûr” (2012) ve “Menewşî” (2020) adlı hikâye kitapları; Nadire Güntaş Aldatmaz’ın “Pîyê Mi Kemane Cinitêne” (2013); Burçin Bor’un “Hêvîya Macire” (2013); Şeyda Asmin’in “Zeman Sey Fekê Kardî Bî (Hikayeyê Koyî)” (2013); Lorin Demirel’in “Vîndîbîyaye” (2014) adlı hikâye kitapları feminist bir bakış açısıyla analiz edilmiştir. Bu eserlerde sunulan kadın karakterlerin üslup ve bakış açıları ile genel olarak temsiliyet biçimleri üzerinden kadın temsiliyetini izlemeye çalıştık. Bu kadın yazarların konu ve tema açısından herhangi bir ayırt edici

özelliğe sahip olup olmadıklarını ve eserlerinde kadınların hayatlarından hangi kesitleri gösterdiklerini incelemeye çalıştık. Bu çalışma, cinsiyet normlarının bu kadın hikâye anlatıcılarını ve kadın hikâye kahramanlarını nasıl etkilediği gibi konuları analiz etmeyi amaçlamaktadır. Bu çalışmada adı geçen kadın hikâye anlatıcılarının hikâyeleri bu soru ve sorunlar bağlamında feminist edebiyat eleştirisi çerçevesinde incelenmiş olup bu sorulara yanıtlar aranmıştır.

Anahtar Kelimeler: feminizm, Zazaki edebiyatında kadın yazarlar, Zazaki edebiyatında hikâye, Nadire Guntaş Aldatmaz, Bedriye Topaç, Burçin Bor, Lorin Demirel, Şeyda Asmin

Destpêk

Mîyanê edebîyatê kîrmanckî (zazakî) de hûmara nuştexanê cinîyan zaf tay a. Na rewşe heme tewiranê edebîyatî de zî (çi şîire, çi hîkaye, çi roman) xo mojnena ra. Coka herçiqaş ewro êdî hîkayeya kîrmanckî çi hetê çendî ra çi hetê senîniye ra biresa sewîyeyêk zî hûmara kitabênê hîkayeyan yê cinîyan hema des engîştanê ma nêvîyarnenê. Texmînî ewro pancas kitabê hîkayeyan yê kîrmanckî çap bîyê (Yıldız, 2020); (Yıldızhan, 2021). Nê kitabên ra tenya hewt kitabê hîkayeyan hetê nuştexanê cinîyan ra ameyê nuştene ke ê zî nê yê: Nadîre Guntaş Aldatmaz, *Pîyê Mi Kemane Cinitêne* (Aldatmaz N. G., 2013); Bedriye Topaç, *Bero Sûr* (Topaç, 2012) û *Menewşî* (Topaç, 2020); Lorîn Demîrel, *Vîndîbîyaye* (Demîrel, 2014); Burçîn Bor, *Hêvîya Macire* (Bor, 2013); Şeyda Asmîn, *Zeman Sey Fekê Kardî Bî (Hikayeyê Koyî)* (Asmîn, 2013); Pinar Yıldız, *Hîkayeyê Hewn û Hişyarî* (Yıldız, 2021). Kitabê hîkayeyanê Yildize mîyanê sînoranê na xebate de nîyê. Ma na xebate de, ê şeş heme kitabê hîkayeyanê bînan, bi ewnîyayîşêkê femînîstî analîz kerdê.

Rexneyo femînîst, mîyanê rexneyê edebîyatî de tayê probleman ser o vindeno. Amancê rexneyê femînîstî yê serekeyan ra yew, o yo ke nuştexê cinî û berhemê înanê ke mîyanê tarîxê edebîyatî de nêameyê diayene, bivînê, înan wedê û bi nê şekilî newe ra yew tarîxê edebîyatî virazê. Amancêko bîn zî, reyna analîzê edebîyatê pederşahî bikê û nê metnan de cinîyî hetê komelî, kulturî û sîyasî ra senî mojnîyayê ra, tesbît bikê. Rexneyo femînîst seba wendoxan zî teknîkanê neweyan peşnîyaz keno û mefhûmê “wendoxo/a femînîst/e” ser o vindeno. Rexneyo femînîst, sey yew “nuştexe” cinîye ser o vindeno û îdîa keno ke, psîkolojîyê înan û mîyanê komelî de cayê înan, nuştexanê cinîyan ser o tesîr keno. Ê reyna îdîa kenê ke nuştexê cinîyî wayîrê yew tradîsyonî yê hemparî yê. Çike, ê mîyanê tarîxî de maruzê heman tadayan bîyê. Coka tradîsyonê nuştîşê înan, yê nuştexanê camêrdan ra cîya yo (Humm, 2002: 26). Ma zî na xebate binê sîya nê

ewnîyayîşî de awan kerd û waşt bimojnê ra ke hîkayenuştoxê cinîyî yê edebîyatê zazakî sey yew nuştoxê hîkayeyanê xo de karakterê xo yê cinîyî û cuya înan senî afirnaya.

1. Mîyanê Dinyaya Edebîyatî de Cayê Cinîyan

Mîyanê heme edebîyatê dinya de serdestîya nuştoxanê camêrdan eşkera ya, hûmara nuştoxanê cinîyan hîna tay a û vengê nuştoxanê cinîyan goreyê nuştoxanê camêrdan dinyaya edebîyatî de hîna erey berz bî. Gilbert û Gubar zî kitabê înan o ke ewro êdî seba femînîzmî kitabanê serekeyan ra yew o de bala nuştoxanê ancenê nê meseleyî ser:

”Raşta zî seke ma û înanê bînan zî muşahade kerd, vîyarteyê cinîyan çi wext nêmaneno vîyarteyê camêrdan. Sey nimûne ganî ma bipersê ke çira seba nuşteyanê cinîyan yew ewnîyayîşê ma yo dewrêkê zernênê bînî esto -dewrê Bronteyan, Eliot, Dickinson û Rossetti yew çeşît ronesansê cinîyan o. Çira no hal dewro ke ma sey ronesansî name kenê de ney, seserra newêşine de vejîno hemverê ma?” (Gilbert & Gubar, 2016: 23).

Bêguman cewabê nê persan qaso ke tîya de nêşkê bêrê îzahkerdene derg ê û sebebê ci yew hetin nîyê. La no hal ewro zî tesîrê xo nuştoxanê cinîyan û edebîyatê înan ser o mojneno ra. Çike wexto ke cinîyî kewtê mîyanê cuya komelkî, cuya xebate, cuya edebîyatî, qasê embazanê xo yê camêrdan wayîrê şansî nêbî, yanî sey nuştoxanê camêrdan, vernîya înan de yew nimûneyê çend seserran çinîbî, seba nê rojanê înan kesî yew sermayegozarî nêkerdibî. Virginia Woolf bala ma ancena nê meseleyî ser o:

“Werrekna Anne Seton û maya aye û maya aye zî o hunero gird o ke ci ra vanê pereqezenkerdiş bimusayêne û pereyê xo, sey pîyanê xo, bawkalanê xo seba şuxulnayîşê cinsanê xo waqîfê zanîngehan, lektorîye, xelatî û bursî awan bikerdêne û înan rê biverdayêne, o wext (...) ma, cigêrayîşî kerdêne, nuştêne, cayê pîrozê rîyê erdî de şewş-şewş çerixîyayêne, fikranê xorînan mîyan de, palikanê Partenon de ronîştêne yan zî saete des de şîyêne ofîsê xo, çar û nîm de seba tayê şîrenuştişî birehetî şîyêne keye” (Woolf, 2015: 25-26).

Beno ke coka cinîyî mîyanê tarîxê edebîyatî de hem sey nuştoxê hem zî sey kerdoxê tewiranê edebîyatî apey de mendê. Ganî yan yew nuştoxê camêrd bibo ke zaf weş cuya cinîyan bizano, tehlîl biko û eseranê xo de bimojno ra yan zî cinîyê nuştoxî yê ke hûmara înan tay ê, binusê. Virginia Woolf, nuşteyê xo *Women and Fiction* (Woolf, 1929: 79) de bala ma ancena ser ke ganî ma sernameyê nê nuşteyî bi di şekilan biwanê: Cinîyê ke nusenê û fiksîyonê înan yan zî fiksîyon

o ke derheqê cinîyan de ameyo nuştene. Yanî cinî eşkenê hem bibê kerdoxê (afirnayoxê) edebîyatî hem zî objeyê edebîyatî. Seba ke sey afirnayoxe-nuştuxe- cinîyan erey dest bi nuştîşî kerd, ê verê cû sey obje mîyanê edebîyatî de mojnîyayê ra. Nuştoxanê camêrdan, ê bi ewnîyayîşê xo, bi normanê komelî mojnayê ra û zaf reyî derheqê înan de hukmê qetî nayê ro û nuştê. Cinîyê ke cuya rojane mîyan de xora heme hetan ra derûdormeyê înan ameyo tepîştîş, mîyanê edebîyatî de zî bi şekilêkê marazî, bêhêz, belengaze, muhtace û sey yew cinsê nêmcetî ameyê teswîrkerdene. Fikr, hîs, xeyal û waştîşê înan nêameyê fehm kerdiş û coka nêameyê nusnayîş û mojnayîş. Nuştoxanê cinîyan zî wexto ke dest bi nuştîşî kerd, bi teqlîdê nuştoxanê camêrdan ê ke înan ra verî dest bi nuştîşî kerd û cinîyê teswîr kerdê, nuşt. Tesaduf nîyo ke zafê nê cinîyan verê cû bi nameyê camêrdan nuşt û ê teqlîd kerdê. Simone de Beauvoir bala ma ancena nê meseleyî ser, "Cinî hema mîyanê şaşî û xururê qebulbîyayîşê dinyaya fikr û hunero ke malê camêrdan o, de yê; coka ê bêveng-bêveng ronîşte yê; cesaret nêkenê ke nerehetî bidê kesî, cigêrayîşan bikê û sey yew bomba biteqê" (Beauvoir, Kadın "İkinci Cins", Bağımsızlığa Doğru, 1993: 145). Nuştoxanê cinîyan ra zaf tayî, komel û normê ke cinîyan sînor kenê ser o vindertê û rexneyê polîtîkayanê cinsîyetî yê dewrê xo kerd.

Mîyanê komelê kurdan de cayê cinîyan meseleyêko munaqeseyên o. Komelê kurdan mîyanê wextî de bedilîyayo. Nê bedilîyayîşî bedilîyayîşê rolê komelî û cinsîyî xo reyde ard. Folklorê kurdkî mîyan de, tayê çimeyanê oryantalîstan de û mîyanê tayê entelektuelanê kurdan de cinî yenê îdealîzekerdene û bi rolêkê azadî mojnîyayê ra (Allison, 2013); (Galletti, 2013). Herçiqaq vatişêko sey cinîyê kurdan goreyê cinîyanê cîrananê xo hîna azad ê, bibo zî goreyê ma no hal seba heme komelî nêşkeno bêro vatiş. Labelê bileksê nê îmajê îdealîzekerdeneyî yew îmajêko bîn yo seba cinîyanê kurdan vila bîyo esto. Handan Çağlayane zî bala ma ancena ser ke çorşmeyê kesanê ke zafane nasname û komelê kurdan nas nêkenê de cinîyê zafane sey "qurban" ameyê îdealîzekerdene labelê goreyê aye na rewşe seraser wina nîya:

"Xelet nêbeno ke ma vajê, terzê nezerê entelektuelanê kurdan û berhemanê înan de rewşe, eksê nezerê 'qurbanbîyayîşî' yo; cinîyê kurdî sey şexsanê azadan mojnîyenê ra ke keye û komelî de cayêko berz de yê û zafane wayîrê wesfanê serekeyan ê. Teza 'cinîyê kurdî mîletanê cîranan ra hîna azad ê ke peynîya seserra 19. û serê seserra 20. de qiseyanê roşnvîranê kurdan de cayêko merkezî de ya, ewro zî qismen vajîyena" (Çağlayan, 2013: 57).

Labelê mîyanê komelî de hişmendîya azadîya cinîyan, bi mucadeleyê hereketê kurdan û dewan ra ver bi şaristanan koçkerdiş û bi wendiş, nuştîş û gurîyayîşê cinîyan bî vêşî. Nê halî zî mîyanê komelî de rolê cinsîyetî yê neweyî viraştî û komel mecbûr mend ke nê rolanê neweyan munaqeşe biko. La seba ke mîyanê komelî de yew bingeşê nê rolanê cinsîyetî yê neweyan çinîbî, nê bedilîyayîşî yew proseso zaf zehmet viraşt. Çike heman wextî de cinîyî hem keyeyanê xo de, bi rolanê xo yê klasîkanê ke komelê pederşahî nabî milê înan ser o ciwîyayêne hem zî koyan de mîyanê şerî de şer kerdêne. Hetêkê bînî ra zî bi bajarijbîyayîşî mîyanê komelê kurdan de problemê neweyî yê rolanê cinsîyetî vejîyayê meydan. Dewe ra ver bi şaristanan koçkerdişî reyde yew şekilê ciwîyayîşî yo newe virazîya. Hem seba cinîyan hem zî seba camêrdan entegrebîyayîşê na cuya newa û xoser yew problem bî. Labelê ewro domanê wextê koçî, mîyanê cuye de êdî ferdê. Bêguman problemê nê kesan (domanê ê wextî) sey nesilanê verênan bi bajarijbîyayîşî ya çinîyê. Labelê sereyê nê kesan rolanê cinsîyetî de hîna zaf tîmîyankewte yo. Çünke nesilanê verênan de rolê cinîyan û camêrdan hîna zaf zelal û klasîkî bîyê. Nê ferdê nesilê neweyî bi şekilo verên û klasîk bîyê pîlî labelê no nesilo newe êdî baş vînenê ke bi nê şekilî yew komelo newe nêvirazîyeno. Esas proseso zehmet o yo ke no nesilo newe xo de xîretê awankerdişê yew komelê neweyî nêvînenê. Ferdê nê komelê neweyî ne sey may û pîyanê xo “cinî” û “camêrd”ê klasîkî yê ne zî sey ferdanê dewrê xo yê. Bi vatişêkê bînî nê ferdî, ê kes ê ke “araf” de mendê. Mîyanê hîkayeyanê nuştexanê cinîyan de zî ma na tîmîyankewteyî û nê prosesê zehmetî vînenê. Beno ke seba nê prosesê zehmetinî ra edebîyatê kirmanckî mîyan de (esasê xo de heme edebîyatê kurdkî mîyan de) ma zaf zêde veng û rengê nuştexanê cinîyan nêvînenê. Herçiqas entelektuelanê kurdan mîyan de seba teşwîqkerdişê cinîyan vatişêko pozîtîf bibo zî edebîyatê kurdan mîyan de reyna zî hûmara nuştexanê cinîyan zaf tay a. Nadîre Guntaş Aldatmaze mîyanê dinyaya edebîye de, sey yew nuştexa cinîye bileksê astengan, hertim teşwîqkerdişî mojnena ra:

“Wile ez çî zur bikerî, dinyaya edebîyatê ma de avantajê mi bî. Mi heyatê xo de hîna avantajê cinîbîyene nêdîbî. La tîya de, dinyaya edebîyatê ma de ez hîna rastê çîyêde negatîfî nêbîya. Mi heta nika çîk ke nuşt pêro weşanîyayî. Çike edebîyatê ma hîna zaf newe yo û heta nê serranê peyênan mabênê nuştexanê ma de qet cinî çin bî. Ez vana coka ma cinî tenêna avantajin bîme” (Aydin, 2014: 37).

Seke vatena Nadîre Guntaş Aldatmaze ra zî dîyar o, tradîsyonê nuştîşê kurdan mîyan de, seba teşwîqkerdişê cinîyan, yew ewnîyayîşo pozîtîf esto. La reyna zî nuştexê cinîyî hem wayîrê problemanê heme nuştexanê kurdan ê hem zî rolê cinsîyetî yê ke komelî ê ronayê milê înan ser o,

reyde mucadele kenê. Komelo ke qîymet bido cinîyan, cinî sey yew ferdî bivîno û biverdo cinî bibê wayîrê heqanê xo yê bingeşyan (sey heqê wendiş û xebitîyayîşî) mîyanê ê komelî de cinî hîna aktîf benê. Labelê komelê kurdan û mîyanê dinyaya edebî ya kurdan de taybîyayîşê cinîyan ver de problemêko gird yo bîn zî problemê zîwanî yo. Yanî beno ke zafê cinîyê xurtî yê kurdanê ke eşkayê cuya xo awan bikê beno ke seba ke nêeşkenê zîwanê xo de biwanê û binusê nêeşkenê mîyanê dinyaya edebî ya kurdî de cayê xo bigîrê.

Mîyanê dinyaya edebî ya cinîyan de meseleyêka girde zî na ya ke gelo wexto ke cinî binusê eşkenê mîyanê edebîyatî de xo rê yew tradîsyon bivirazê? Çünke nuştîş hetêk ra zî îfşakerdişê komelî yo, komelo ke cinîyan apey de verdano û înan qije vînenê. Gelo cinî hemverê nê ewnîyayîşî de, bi berhemanê xo eşkenê xo ver bidê û rewşa heme “kêna, maye û wayanê xo” bi hîsê “wayîtî” bîyarê zîwan. Berna Moran, Elaine Showalter² ra neqil keno ke cinîyî eşkenê bi rayerê edebîyatî bibê wayîrê yew hêzê winasîyî:

“Yew tradîsyonê nuştexanê cinîyano cîya esto, çünke tarîx de cinî merûzê heman tedayan bîyê. Mîyanê na rewşe de nuştexê cinîyî, dinya û cuye, camêrdan ra cîya bivînenê normal o, la no cîyabîyayîş, cîyabîyayîşêko bîyolojîk nîyo. Yew encamê tedaya ke cinî mîyanê komelî de merûzê ci benê, o yo. Cinî mîyanê komelî de yew binkultur (subculture) virazenê û nê sebebî ra cuyê ke romanên nuştexanê cinîyan de yenê vatiş, hereketê ke kenê û erj û qîmetê ke ê pawenê (mudafa kenê) yew ê, qet nêbo manenê pê” (Moran, 2008: 255).

Seba edebîyatê kurdî zî no mesele zaf muhîm o û beno ke do wext bimojno ra ke gelo nuştexê cinîyî kurdî do bieşkê bibê wayîrê tradîsyonêkê xurtî yan zî ney.

2. Analîzê Berheman

Serra 2011î ra dima mîyanê hîkayenuştexîya zazakî de vengê cinîyan hîna zaf berz bîyo. Hîkayeyanê nê nuştexanê cinîyanê ke bîyê babeta na xebate mîyan de zî hetê tema û zîwanî ra heman tradîsyono hempar esto. La seba ke ma bieşkê behsê yew tradîsyonî bikê, ganî hem hûmara nuştexanê cinîyan hîna zêde bibo hem zî nuştexê ke na xebate de ma bahsê înan kerdo xebatanê xo bidomnê. Yanî Şeyda Asmîn, Lorîn Demîrel û Burçîn Bor tena wayîrê yew kitabî yê û rewna ra înan ra veng nêvejiyeno. Gelo do nê nuştexî xebatanê xo bidomnê û bieşkê mîyanê edebîyatê kîrmanckî de xo rê yew ca û tradîsyon virazê? Na xebate de ma şêş kitabê hîkayeyanê

² Elaine Showalter, *A Literature of Their Own*, Princeton University Press, 1977, r. 11.

ke hetê nuştovanê cinîyan ra ameyê nuştene bi ewnîyayîş û rexneyo femînîstî analîz kerd (Humm, 2002).

2. 1. Pîyê Mi Keman Cinitêne

Nadîre Guntaş Aldatmaz serra 1963î de dewa Pîlvankî ya Mamekîye de maya xo ra bîya. Zafê nuşte û hîkayeyê aye kovara *Şewçila* û *Vate*; rojnameyê *Newepelî* û keyepelê *Zazakî.Net* de weşanîyayê. Tezê aye yê masterî serra 2013î de ame qebûlkerdene (Aldatmaz, 2014). Heman serre de nuştuxe sanikê Mamekîye arê dayê û weşanayê (Aldatmaz N. G., 2016). Heman serre de kitabê aye yê hîkayeyan weşanîya (Aldatmaz, 2013). Serra 2016î de romanê aye *Piltane* weşanîya (Aldatmaz N. G., Piltane, 2016) û heman roman bi nameyê *Xewn* açarîya kurmanckî ser (Aldatmaz N. G., 2019). Serra 2020î de tezê aye yê doktora ame qebûlkerdiş û badê cû sey kitab zî çap bî (Aldatmaz N. G., 2021).

Guntaş, bi xebatanê xo yê akademîk û edebîyan nuştovanê welûdan ra yew a. Kitabê aye yê hîkayeyan *Pîyê Mi Keman Cinitêne* mîyanê hîkayeyanê hîkayenuştovanê cinîyan de cayê xo girewto. Nê kitabî de destpêk de panc hîkayeyî estê. Nê hîkayeyî ca-ca xususîyetanê otobîyografîkan xo de hewênenê. Nê hîkayeyan de cinîyî û dinyaya înan rasterast nêameya munişî labelê mîyanê cuye de, cinîyî zî para xo zafê meseleyanê komelkîyan û sîyasîyan ra gênê.

Heşt hîkayeyê nê kitabî binê sernameyê *Dinyaya Cinîyan ra Hîkayeyî* de ca gênê. Nuştuxe bi nê hîkayeyanê nê beşî dekewena mîyanê cuye û dinyaya cinîyan û înan mojnena ra. Nê heşt hîkayeyanê cîya-cîyayan de, nuştuxe problemanê cinîyanê dinyayanê cîyayan, mojnena ra. Karakterê cinî yê nê hîkayeyan nesilanê (azanê) cîyayan ra yê ke rewşa înan ya ekonomîk û perwerdeyî herçiqas bibedilîyo zî ma nê hîkayeyan de vînenê ke nê pêro cinîyî binê heman barê rolanê komelkîyanê cinsîyetî de eciqîyenê û helîyenê. Çi ê cinîyê ke sey cinîyanê “klasîkan” name benê, çi ê ke sey hîna “modern” (qet nêbo wenda yê û wayîrê karêk ê) pêro zî peyên de nê pergale û nê rolanê cinsîyetî yê komelkî reyde yenê têrî. Çike seke Kate Millett bala ma ancena ser komelo pederşahî, cinîyan hemverê yewbînan de ronano û înan muqayese keno. Verê cû fahîşeyî û cinîyê binamûsî ameyêne muqayesekerdene ewro cinîyê ke şuxulîyenê û cinîyê keyeyî yenê muqayesekerdene. Camêrdî bi rehetî eşkenê dekewê mîyanê cuya herdîne zî û eşkenê nê cinîyan hemverê yewbînan de bikê rakîb (Millett, 2011: 68-69). Nê kitabê xo yê hîkayeyan de, binê

sernameyê *Dinyaya Cinîyan ra Hîkayeyî* de, Guntase cuya cinîyan ra parçeyanê cîya-cîyayan mojnena ra, ê parçe yê ke Guntase cuya cinîyan ra sey hikaye pêşkêş kena nê yê:

Hîkayeya *Torbeyê Xeycane* de, Xeycane mexdurê Terteleyê 38î ya. Destpêk de na hîkayeya Xeycane nêna vatişî badê cû qehremana benameya hikaye ya ke heman wextî de vatoya hikaye ya, Xeycane dana şinasnayîş. Domanîya na qehremana hikaye de Xeycane her ke mêrdeyê xo ra kutiş wena bi torbeyê xo yena keyeyê na qehremaneînan. Seba ke Xeycane hertim nê tewreyî xo reyde çarnena her kes meraq keno ke zereyê nê tewreyî de çi esto. Labelê maya qehremane seba ke nê tewreyî sey emanetê Xeycane vînena nêverdana kes akero. Labelê rojêk Xeycane tewreyî emanetê maya qehremane kena û şina. Badê çend aşman rojêk maya qehremane şina keyeyê cîranan û hevalê aye yenê keye û zaf zor danê aye ke ê tewreyê Xeycane akerê, qehremane zî êdî bi meraq nê tewreyî akenê. Zereyê tewreyî de tîlikê basme, kurasan, tayê paç û puçî û boxçeyî estê. Boxçeyêk de citeyêk tumanî û pirênêko sipî esto. Boxçeyêka bîne de mîyêka sûra qatkerde û mîyanê ci de zî zerdêko gird esto. Boxçeyêk de zî kincê pitike û veyvekêka paçine estê. Qehreman derheqê nê tedeyîyanê tewreyî de o wext nêşkena meraqê xo tamam bika. Badê cû ê dewe ra bar kenê û şonê şaristan labelê maya aye kilîtêkê keyeyî dana Xeycane ke a key biwaza wa şora uca de rehet bika. Rojêk na qehremane şina dewe ke Xeycane zî uca ya û seba ke nêzdîyê aye biba û hîkayeya aye bimûsa aye zî a şewe dewe de leyê Xeycane de manena. Peynîye de a resena miradê xo, a mîye û zerd, ê kêna Yîvî Yemoşe yê ke a wextê meseleyanê armenîyan de ameya kiştîş. Xeycan rojêk wexto ke şina malî ver cesedê aye vînena û na mîye û zerdî gêna û ana sey emanet nimnena ke eke rojêk maye û pîyê aye bêrê bida înan.

Reyna boxçikêka bîne ya nê tewreyî zî emanetê merdeyanê 38î yo. O wext mêrdeyê Xeycane û kêneya aye Dermane zî remenê labelê Xeycane înan ra qet xeber nêgêna. Her ke şino hêvîya aye şikîyena labelê qet nêqedîyena. Hêvîya maye û pîyê Xeycane bi ameyîşê mêrdeyê aye nêmanena û aye danê mêrdeyî. No zewac seba aye tam ezabêk o labelê goreyê pîyê aye o camêrdêk o û teba nêbeno. Ê kinc û veyveka ke Xeycan seba kayî viraştê, ê kêneya aye Dermane yê. Seba hêvîya rojêk ameyîşê înan, aye ê zî sey emanet zereyê nê tewreyî de nimitê. Seke aseno na hikaye de Xeycane, cinîyêka mexdurê dem û dewranêk a. Bi zewacê aye yê diyinî na mexdurîya aye biheqeret, kutiş dewam kena û zafê rolanê komelkîyanê cinsîyan ra a nêşkena mêrdeyê xo ra bîaqîtiya zî. Tenya wexto ke êdî nêşka tehemul bika yena keyeyê na qehremane, çike “Pîyê mi

sûke de xebitîyêne, keye de camêrd çin bî. Coka cinî kam ke sereyê xo bidezê ameyêne keyê ma. Derdê xo maya mi ra vatêne” (Aldatmaz N. G., 2013: 40).

Hikayeya *Almancî* yew parçeyêko bîn yê cuya şarê kirmancan û cinîyan o. Koçberîya Ewropa mîyanê şarê kurdan de tenya sebebên sîyasîyan ra nîya. Zafê mintiqayan de seba rewşa ekonomîke ra, yanî seba kardestfînayîşî zafê kesan, zafane camêrdan keyeyê xo, doman û cinîya xo welat de ca verdayê û sey karker koç kerdo Ewropa. Na hîkaye de zî rewşa yew keyeyî yê winasî esta. Yanî pîyê nê keyeyî zî êdî “Almancî” yo. Şar seba heme ê kesê ke şinê teberê welatî nê termî şuxulnenê yanî seba înan Hollanda, Belçîka qet ferq nêkena. “Yanî nameyê xerîbîye welatê ma de ‘Almanya’ bîye” (Aldatmaz N. G., 2013: 52). Labelê na raywanîya xerîbîye, keyeyan ser o zaf tehrîbatan virazena. Çike doman û cinîyê ke welat de pî û mêrdeyanê xo pawenê, emrê înan bi pawitişî ya vîyareno. Ê kesî ke şîyê xerîbîye zî emrê înan xerîbîye de bi tehdavînayîşî û bedilîyayîşî vîyareno. Wexto ke ê çend rojî seba tetîlî agêrenê zî no bedilîyayîş seba cinîyanê înan nêbeno şabîyayîşêk bîleksê ci beno ezabêk, çike; “Camêrdê ma yê ke şîyê Almanya çend serrî ra tepîya yan bi yewade porzerda goştine yan kî bi tirkade pêtike rêştike peyser ameyêne. Qulê ma kî nînan rê xizmet kerdêne. ‘Gune yê, xerîb ê, bê ma û bê pî yê.’ Vatêne ver de ameyêne, şîyêne” (Aldatmaz N. G., 2013: 52). Heman trajedî ameya qehremana vatoxe ya na hîkaye ser o ke maye û pîyê aye zî heman rewşe de yê. Na hîkaye de ma nê ameyîşê pîyî; derd, hesret û xeyalşikîyayîşê maye, çimanê qehremana vatoxa gedê ra vînenê ke no teknîk tesîrê hîkaye hîna zêdneno.

Hîkayeya *Serekirî* yew rewşa zafê cinîyan yê kurdan mojnena ra. Cinîyê ke pê ser o çend gedeyê kênayê ardê û lajê înan çinîyê. Na tema edebîyatê kurdî mîyan de bîlhesa hetê nuştexanê cinîyan ra zaf zêde ameya nuştiş. Çike komelêkê pederşahî de cinîyî ancax eşkenê bi lajanê xo, bi hûmara lajanê xo, xo rê cayêk bivînî yan zî cayê xo pêt bikê. Na hîkayeya Aldatmaze zî na rewşe ser o ya. Nameyê hîkaye zî tîya ra yeno. Yanî domanê kênayê ke înan ra dima kênayî benê sey “serekir” û ê ke înan ra dima lajî benê sey “serezerrêne” name benê. Na hîkaye de zî Aldatmaze çimanê yew kênaya des û hîrê serra ra rewşa maya aye mojnena ra. Maya na qehremane têdima şeş kênayî ardê û tengijînê hêvîya yew domanê lajî nê keyeyî de dest pêkerdo. Çike ters o yo ke pî “ocaxkor” bîmano û coka “Cinîyê dewe pêro tim diganî bî, qanûnê dinya nîya bî. Ê ke diganî nîyê kî ‘huşk’î bî. Ez çiqas ke ê wextî ser o bifikirî, cinîyê diganî yenê re mi vîrî, domanê vîre de, domanê virare de, domanê kî pê dest girewtê” (Aldatmaz N. G., 2013: 58). Çike qayîde yê cematî

huşka-huşk dîyarkerde yê û statu û cayê cinîyan goreyê nê qayîdeyan virazîyeno. Badê şeş kênayan wexto ke maya qehremane domanêko laj ana heme rewşa keyeyî bedilîyena, “Bi bîyayîşê Memî keyê ma de statuyê her kesî vurîya. Maya mi herinda xo rind kerde qayîm, pîyê mi tenêna sereberz fetelîya. Ez resta nameyê xo yê rastkênî, waya min a qije kî bîye serezerre!” (Aldatmaz N. G., 2013: 59). Bi bîyayîşê nê domanê lajî yo ke cûya heme keyeyî bedilîyena de seke êdî hîkayeya maye tamam bena û na reye hîkaye û tengijînê qehremana vatoxe bi rolanê komelkîyanê cinsîyan dewam kena. Ê keyeyê xo benê şaristan û qehreman êdî wextê balixbîyayîşê de ya, şîna mekteb. Bi nê pêhesîyayîş û arqilîyayîşê hîs û bedenê xo, aye yew embazê xo yê sinife ra hes kena. Rojêk wexto ke pî aye û nê lajekî pîya vînenê kênaya xo mektebî ra gêno. Kêna di serrî êdî keye de karê keyeyî kena, no mabên de embazê aye mektebê mîyanênî qedînenê labelê pî qerar dano ke kênaya xo yewêko “qefçil, kokim, kilmekî” de bizewicno. Kêna yanî qehremana vatoxe ya hîkaye hemverê na rewşe de sey çareyêkê peyênî keye ra remena. Na hîkaye de destpêk ra hema hîkayeya maye ra qehremane, rolanê cinsîyanê komelkîyan de yena têrî. Çike a pîzeyo ewil a, wexto ke maya xo ra bîya, keye pabeyê yew gedeyê lajî (Mem) bîyo, coka nameyê aye sey “Memo zirzir” mendo, aye ra dima kênayî bîyî û a serekirî ya ewil a. Dima tenya seba ke yew reye yew embazê xo yê lajî de nêzdîyê mektebî de qisey kerdo û pîyê aye, aye dîya heme qedera aye bedilîyena û tewr peynî zî aye sey rayerêkê “xelasî” remayîşî vînenê.

Hîkayeya *Heqî Vengê Mi Nêheşna* de zî hîkaye çîmanê yew kênaya xama û azebe ra ameya dîyayîş û peynîye de na kêna zî sey rayerê xelasî remayîşî de çare vînenê. Na hîkaye de qehremane verê cû zewacê maye û pîyê xo mojnena ra ke pî heqaret û tehda bi cinîya xo û hîrê domananê xo keno. Maye bi kuwayîş dekeno halê mergî, çareyê maye yo peyên, keyeyê pîyê xo şîyayîş o. Labelê pîyê aye vano, “Mêrdeyê to yo, çend tarpikî dayî to ro kî teba nêbeno, domanê to estê” (Aldatmaz N. G., 2013: 63). Tewr peynî mehkema daxîlê dewa bena û di kênayan dana maye, lajî zî dana pî. Labelê çend serran ra dima kalik kênaya xo û di torinanê xo sey barî vînenê, seba ke înan ra bixelisîyo maye reyna zewicneno. No zewac verê cû baş aseno, maye û di kênayê xo nê keyeyî de seke biney huzur vînenê. Labelê badê di serran maye hemîla manena û qehremana hîkaye zî êdî deketê wextê buluxî. Maye wexto ke seba doximî şîna nêweşxane, mêrdeyê aye tecawuz bi na kêna keno. Roja bîne verê ke maye nêweşxane ra bêra qehremana hîkaye keye ra remena. Seke aseno sey çarevînayîşî, remayîş para qehremananê hîkayeyanê

Guntaşe yo. Qehremanê hîkayeyanê aye hemverê tehdeyanê komelê pederşahî ra ancax bi remayîşî eşkenê ”çare” û “xelasêk” bivînê ke peynîya ameyoxê înan dîyar nîya.

Hîkayeya *Pawitişî* hîkayeyêka eşqî ya. Eşqêko bêomîd, bêimkan û platonîk. Gule fakulteya hukukî de senîn ke Alîyî vînena nêvînena aşîqê ey bena û na hîkaye zî raywanîya eşqê Gule ya. Çike badê çend aşman Alî orte ra vindî beno ke seba têwgeranê eyî yo siyasiyan ra yo. Êdî Gule heme cuya xo bi pawitiş û vînayîşê Alî derbas kena. Mekteb ra mezûnbîyayîşê aye, badê cû şîyayîşê aye yo Ewropa zî reyna seba vînayîşê Alî yo. Labelê tewr peynî wexto ke a Alîyî vînena, Alî zewicîyayo û no eşqo platonîk o ke pawitişî ra xurt beno heme hêvîyanê xo vîndî keno û seke Gule hema newe maya xo ra biba hende sivik bena.

Hîkayeya *Tersê Zewacî* yew hîkayeya ke rasterast rolanê komelkîyanê cinsîyan ser o awan bîya û derheqê meseleya “bekaret” û zewacê ke bi nê şertî ser o awan bîya de ya. Sey zafê kênayanê komelanê pederşahîyan qehremana hîkaye zî zaf rew nê term û qayîdeyanê komelî nas kena: “Ez ke hîna domane bîya zaf heşnayêne ke filan ca de filan kese kênêk nêvejîyaya, cinîke bîya, mêrdeyî peyser berda keyê pîyî” (Aldatmaz N. G., 2013: 80). Hîkaye bi na cumle dest pêkena û qehremane her ke pîl bena nê cumleyan hîna baş fehîm kena: “Ez ke bîya pîle, bîya kênêkade azebe, hîna musaya ke kênêkîye û cinîkîye çik ê. Wextê gencênîya mi de hîna çarşefe musnayêne re mîletî” (Aldatmaz N. G., 2013: 80). Qehremane bi xo zî her ke pîl bena û zewac nêzdîyê aye beno tersê aye zêdîyeno. “Tersê ma kênekanê azeban eynî bî: ‘Gonî ke nêro se kenîme?’” (Aldatmaz N. G., 2013: 80). Hemverê nê sîstem û tersî de qehremane xo zaf zeyîf û bêçare hîs kena. Sey çare vana eke mi biwendêne û ez wayîrê maeşêk bibîyêne ez do qet nêzewicîyayêne. Ma vînenê ke qehremane zaf waştî ke biba doktor labelê pîyî mektebê verênî ra dima aye mektebî ra girewta. Labelê heman pîyî seba ke wayîrê karêk bibê lajê xo erşawitê mekteb. Rojêk malimêk aye wazeno û pî zî dano, “Lerza gonî û çarşefe ez girewtane la mi va ney wendo miheqeq, cahil nîyo û nîya teselîye daye xo” (Aldatmaz N. G., 2013: 81). Labelê wexto ke ê nîşanbîyaye yê no malim aye beno doktor “To bena doktorê cinîyan, gelo ti kêna ya, cinî ya, domanê to benê, nêbenê” (Aldatmaz N. G., 2013: 81). Nê sehneyê doktorî de, doktore zî cinî ya û qisayanê ke aye nê malimî rê vana, rexnekerdişê nê sîstem û qayîdeyanê cematê pederşahî yê. Nê sîstemî de “bekaret” sey tabûyêk o û zaf muhîm o. Seke Hanne Blank bala ma ancena ser bekareto ke verê zewacî ameyo xeripnayîş beno sebeb ke piyasaya zewacî de cinîyî sey malêkê bêxebatbar bêrê vînayene ke merdim nêşkeno înan reyde bizewicîyo (Blank, 2019: 80). Labelê

çareyêko bîn yê qehremane çinîyo û aye yew mêrde yo ke wayîrê nê ewnîyayîşî yo reyde zewicîyena. No zewaco ke bingeşkê baş û pêtî ser o awan nêbîyo helbet bi hîna heqaret û tehdayan dewam keno. Heta ke rojêk no malim aye bi kuwayîş dekeno halê mergî. Nêweşxane de doktor heqê raye dana aye û aye nêweşxane ra remena. Seke aseno na hîkaye de zî qehremane ancax bi remayîşî hemverê nê sîstemî de çareyêk vînenê û reaksiyonêk mojnena ra.

Hikayeya *Mêrdeyo Demokrat* cuya cinîyan ra yew parçeyê bînî mojnena ra. Qehremana hîkaye Sevîme sey nesil nesilêkê hîna “modernî” ra ya. Çike aye bi saya zewacê maye û pîyê xo fehm kerdîbî ke mîyanê zewacî de “Pî sey axayî bî, maye kî sey koleyê. Coka zaf waştîbî ke biwano, bigurîyo, qet kî nêzewicîyo. Peynîye de wendîbî û bîbî malime” (Aldatmaz N. G., 2013: 87). Aye wexto ke mêrdeyê xo nas kena derheqê zewacî de fikrê aye bedilîyenê. Çike goreyê aye no mêrdeko ke seba heqanê însanan xebitîyeno û “demokrat” o do camêrdanê bînan ra cîya bibo. Labelê mîyanê cuya zewacî de teori û pratîkê mêrdekî werîbînan nêtepişenê û o zî sey heme camêrdanê klasîkan karanê keyeyî, heme baximê xo û cilanê xo zî Sevîme ra paweno. Sevîme herçiqas cinîyêka wayîrê azadîya xo ya ekonomîke zî biba seba kêneya xo nê heme derdan ancena. Labelê tewr peynî de aye zî sey zafê qehremananê Guntaz çareyî keye ra şîyayîş de vînenê.

Hikayeya *Xêşîya Cinîyan* de zî reyna qehremana hîkaye yew nesilê hîna newe û “modernî” ra ya. Qehremana hîkaye, doktorêk a coka keyeyê aye zî wazeno ke yewêkê wende, medenî û wayîrê karêk bibo de bizewicîya ke mêrdek sereyê aye nêdejno. Aye wexto ke wendekar a aşîqê Mistafayî bena ke o zî fakulteya muhendîsiye de yo. Labelê badê zewacî Mistafa tam sey yew camêrdê klasîkî têwgêreno û heme barê keyeyî erzeno milê aye ser o. “Seke o lajeko semt, muhendîso genc û modern şîbî, herinde de yewêde sey pîyê mi, kalikê mi amebî. Ez ke sey maya xo yan kî sey dêka xo bîyêne problem çin bî la ez cîya bîya, ez ne sey maya xo ne kî sey dêka xo bîya coka problemê ma zaf bî. Heta key nîya şîyêne belî nêbî” (Aldatmaz N. G., 2013: 93). Na rewşe de karekterê wayîrê azadîya ekonomîke biba zî sebebê ke aye zewacê xo de kena problem, seba komelî sebebê cîyabîyayîşî nîyê. Çike seke a zî vana “Sebebê cêrabîyayîşê maqulî alkolizm, xumare, cinîkade bîne yê” (Aldatmaz N. G., 2013: 93). Nê sebebî yê parekerdişê rolan yan zî seypêbîyayîş û têduştîye mîyanê komelî de, sey problem nê nê vînayîş. Herçiqas komelî mîyan de tayê bedilîyayîşî bibê û cinîyî tayê hetan ra azadîya xo dest finê zî rasterast parekerdişê tayê rolan de averşîyayîşêk nêvrazîyayo. Seke Beauvoir zî bala ma ancena ser cinîya ewroyêne, bê

xemlûxêz yan zî heywana barî ra vêş çîyêk nîya. Wexto ke aye bixebitîya zî nêxebitîya zî o yo ke ewnîyeno aye camêrd o (Beauvoir, Kadın "İkinci Cins", Genç Kızlık Çağı, 1993: 118). Nê rolê komelkî yê tradîsyonelî bi serran a hende ronîşte yê ke no mesele bi azadîya ekonomîke ya cinîyan zî nêşkena çareser biba. No zewac tewr peynî bi îxanetî qedîyeno û o wext qehremana hîkaye heta o wext seba zafê çîyan tehemulkerdişê xo sey “xêxî” vînena.

Seba azadîya cinîyan bi serran o hetê komelnasan û femînîstan ra çîyo ke zaf zêde ser o ameyo vindertene perwerdeyê cinîyan û karêk destfînayîş û pereqezenckerdîşê cinîyan o. Labelê nê hikayeyanê Aldatmaze de ma vînenê ke cinîyê ke seba perwerdeyê xo û pereqezenckerdîşê xo mucadele kerdo û serkewtê zî mîyanê cuye de û zewacî de zafê tehdayan vînenê. Esasê xo de no problemê seserran rojêk de bi xoverdayîşanê azêk nêbedilîyeno. Çike seke Colette Dowling bala ma ancena ser, “Esasê xo de ma [cinîyî] seba azadî û azadbîyayîşî nêameyê perwerdekerdene, eksê nê çî ma seba girêdayeyîye ameyê perwerdekerdene” (Dowling, 2022: 9). Goreyê Dowling gedeyê kêneyî û lajî hema ke maya xo ra benê nêbenê bi ewnîyayîşanê cîyayan yenê perwerdekerdene, “Cinîyî gedeyîya xo ra seba ke girêdayeyê kesî bibê yenê teşwîqkerdene. Her cinîya ke biewnîya zereyê xo ra do bivîna ke derheqê xoweyîkerdiş, xopawitiş, potansîyelê xo vetîşî de çirey nêameya teşwîqkerdiş. Înan ancax beno ke werrek bi lajan ardo û wina kayê xoserîye kay kerdo” (Dowling, 2022: 10). Labelê cematî mîyan de, lajî û camêrdî roja ke maya xo ra benê nêbenê seba azadîye û xoserîye yenê perwerdekerdene (Dowling, 2022: 10). No ewnîyayîşê cematî yo ke hema bi bîyayîşê înan ra gedeyanê laj û kêneyan yewbînan ra abirneno û înan bi ewnîyayîşanê cîyayan pîl keno, mîyanê komelî de cayê xo girewto û nê meseleyî bi azadîya ekonomîke ya cinîyan rojêk de nêbedilîyenê. Hikayeyanê Aldatmaze de zî na rewşê bi şêkilêkê zaf eşkerayî ameya mojnayene.

2.2. Bero Sûr

Bedrîye Topaç serra 1977î de Dêrsim de maya xo ra bîya. Nuşteyê aye serra 2011î ra nat kovara *Şewçila* û rojnameyê *Newepelî* de û kovara *Vate* de zî tayê hikayeyê aye vejîyayê. Kitabê aye yo hikayeyano verên *Bero Sûr* serra 2012î de çap bî (Topaç, 2012). Şîrê aye bi nameyê *Wextê Heskerdişî* serra 2013î de çap bî (Topaç, 2013). Kîtabê aye yo hikayeyan yo dîyin *Menewşî* serra 2020î de çap bîyî (Topaç, 2020). Serra 2023î de zî hem kitabê şîranê aye *Sebr* (Topaç, Sebr,

2023) hem zî kitabê hîkayeyanê aye yo *Menewşî*, bi nameyê *Binefş* açarîya kurmanckî ser (Topaç, 2023). Nê hîkayeyan de zaf reyî mîyanê komelî de cayê cinîyan, îhlalkerdîşê heqê cinîyan, eşq, cîyabîyayîş, hesretê welatî bi ziwanêkê hîsdarî ameyê dayene (Topaç, 2012: 69).

Bero Sûr de Bedrîye Topaç çarêş hîkayeyî pêşkêşê wendoxanê xo kerdê. Topaçê nê kitabî de her hîkayeya xo de seke zere ra, keye ra a dinyaya cinîyan a ke nuştuxe bi xo zî bi zafê nasnameyanê xo bîya parçeyêkê ci; yan zî nêzdî ra dîya mojnena ra. Nê hîkayeyan ra her yewe de sere ra heta peynîye bi şekilêkê klasîkî rasterast yew hîkaye (serebût) nêmojna ra zî Topaçê bi uslubêkê şîrkî her yewe hîkaye de “dej, hêvî, xeyalşikîyayîş, apeydemendiş yan zî apeydeverdayîşê cinîyan” mojnena ra. Nê hîkayeyan de hîkayeyî bi destpêk û qedîyayîşêkê klasîkî dest pênenê û nêqedîyenê. Yanî hîkayeyî bi karakter, mekan û zemanêkê zelal û dîyarkerdeyî nêmunîyayê. Labelê Topaçê her yew hîkayeya xo de cuya cinîyan ra yan zî ê zîfêr û kêberê ke ê vernîya ci de vinderte yê yan zî wazenê ci ra bivîyarê û vîyarenê mojnena ra. Yanî o terzê hîkayeniştîşê yê Çehovî yo hîkayeya rewşe ya ke ey seserra 18. ya cuya rusan ra parçeyî mojnayêne ra, Topaçê zî her yewe hîkayeya xo de parçeyêko cîya yê cuya cinîyan û kênananê înan mojnena ra. Nê cinîyî û kênayî seke sey hîkayeya peyên a kitabîya ke bi nameyê “Şahê Maran” ci rê bîyo metaforêk cinî û kênayê Şahê Maran ê. Nê kitabê xo de ê parçeyê ke Topaçê, cuya cinîyan ra sey hîkaye pêşkêş kena û na rewşe mojnena ra nê yê:

Nuştuxe, hîkayeya *Perrê Pîyî* de çîmanê yew kênaya 11 serra ra o hêz û qewetê mêrdeyan o ke (bawkan o ke) ê sey perrê cinîyan, hêz û qewetê cuya cinîyan û keyeyî yê mojnena ra. Nameyê na karaktera 11 serra û maya aye hîkaye de dîyar nîyê; labelê pî herçiqas ê ca verdayo û şîyo zî, hêvîya ameyîşê ey hema ra zî sitara keyeyê înan a. Çike maye, kênaya xo ra vana ke “Pîyê to ke ame ma rê beno sitar. Çike perrê pîyan merdimî her çî ra seveknenê” (Topaç, 2012: 9). Coka na karaktera 11 serra ya bêname wazena perranê pîyê “Dila aspicine”, Ap Elî bi çîmanê xo bivîna. Rojêk wexto ke o binê yew tuwêre de rakewte yo a wazena sêneyê ey akera û ê perranê ey bivîna labelê cesaret nêkena. Çike heman maye hema ê emrî de aye teme kerda ke ganî a xo camêrdan ra bipawa. Yanî yew karaktera 11 serra zî bi nê şekilîya bi rolanê komelkî yê cinsîyetî hesîna. Coka wexto ke a nêzdîyê Ap Elî bena her yew bêçika aye, yenê ziwan û aye ra çîyêk vanê. Nê kênayê xama yê ke haya înan bi nê rolanê komelkîyanê cinsîyetî esta, mîyanê cuye de nê çîyan vînenê û persenê labelê ê persanê xo rê cewaban nêvînenê, nê nê fehm kerdene û hetê mayanê înan ra heqeret bi înan yeno kerdene.

Hîkayeya *Têduştîye* ya ke zaf kilm a û diyaloxê Fate (yanî persanê Fate) û maye ra werê yena bi saya nê diyaloxan bi şekilêkê eşkerayî nê rolanê komelkîyanê cinsîyetperestî mojnena ra. Çike persê Fate verê cû maye ra sey “Ti mi ra hes kena? Ti mi ra hendayê birayê mi Memî hes kena?” yê û cewabê maye “belê” yo. Labelê wexto ke Fate persena ke çira wexto ke mêmanî yenê Mem mêmanan reyde ronîşeno sifreyî ser û Fate badê cû pişwerda înan wena, cewabê maye zaf derg nîyo çike maye bi cewabê xo, yew sîstemê ronîşteyî mojnena ra; “O camêrd o Fata mi” (Topaç, 2012: 22). Cewabê Fate na raye biney derg beno ke no sîstem rijîyayîşê îlaheyan o. Nê cewabî ra dima maye zî sey pawitoxa nê sîstemî êdî bi lawayan; yan zî bi çekuyanê nerm û heskerdoxan xîtabê Fate nêkena û vana “Kêna kutikî, dele!” Wexto ke Fate vana ke [nê sîstemî ra] zerrîya mi bena teng, maye reyna sey pawitoxa nê sîstemî tenya eşkena rayerêk bimojna Fate, “Ti dewa mêrdeyî kena?” Labelê esasê xo de Fate tenya “têduştîye” wazena ke xora persa girde zî na ya (Topaç, 2012: 22). Topaç ge-gane zî cuya nê mayanê “klasîkanê” ke mecbûr mendê ke bibê “pawitoxê nê sîstemê pederşahî” mojnena ra. Hîkayeya *Kênayî* trajedîya ê cinîyanê ke seba ke gedeyê înan yê lajî nêbîyê, pê ser o panc-şes kênayî ardê; înan ser o wesnî (hewî) ameya, mojnena ra.

Cinîyê hîkayeyanê Topaç bi dejanê xo yê komelkîyan zî teswîr bîyî. Hîkayeya *Zîyare* de Zilfa ke di domanê aye merdê û nika zî do mecbûr bimana dewe ra vejîya, şina Zîyara dewe de dana pêro. Hîkayeya *Wad* de zî reyna cinîyêka pabeyê lajê xo ya (Xane) esta. Hîkayeya *Giranîya Sozî* de zî Medîna soz dayo maya xo ke herrîya welatî bîyara, xerîbî de mezelê maya xo ser o birijna û wina zî kena. Yanî cinîyê ke domanê xo vîndî kerdî, sey yew diyaxî xo şanayo zîyar û diyanê baw û kalan û dima mecbûr mendê ke ê cayan biteriknê û şorê xerîbîye, tîya de bimirê hîkayeyê înan zî bala Topaç antê û cuya nê cinîyan zî ameya teswîr kerdene.

Topaç tenya hîkayeyanê ê cinîyanê ke heta cayêk no pergalo pederşahî qebul kerdo û bi nê şekilîya ciwîyayê nêmoto ra. Herçiqas hîkayeyanê aye de rasterast zafane emrê karakteran teswîr nêbîyo zî ma vînenê ke hîkayeyan ra cinîyê ke nesilêkê hîna neweyî ra yê; derheqê nê sîstemê pederşahî de fikirîyayê û rolanê cinsîyetî yê komelkî de wayîrê rexneyan ê; yan zî seba ke hemverê nê sîstemî de reaksiyonêk moto ra cuya înan ra zî ma trajedîyan vînenê. Hîkayeya *Eşq Gêj o* de ma hîkayeya Asmîn vînenê. Asmîne mêrdeyê aye yo ke zaf tehda bi aye kerda (ma vînenê ke no mêrde dano aye ro û eraq şimeno) remaya ameya taxêka newa de ca bîya û xo rê keyeyêko mutewazî awan kerdo. Aye xo rê karêk dîyo, yanî waştî ke berê yew cuya newa akera

û zifqêra nê berî ra vîyara zereyê cuyêka newa. Bi yew aşma ke aye na taxe de ciwîyena. Tîya de Welîyo gêj bala aye anceno. Na cuye rojêk bi vînayîşê mêrdeyê aye serûbin bena. Çike mêrdeyê aye êdî cayê aye tesbît keno û werteyê kuça de dano aye ro û aye tehdît keno: “Mi to ra nêvat ti şîrê kotî ez to vînena. Xelasa to destê mi ra çin a. Ney rind mezgê xo de ca bike!” (Topaç, 2012: 56). Nê tehdîdî yê ke qedera zafê cinîyan ê, domîyenê, “Cayê to yan leyê min o yan kî goristan o” (Topaç, 2012: 57). Badê nê kuwayîş û tehdîdan wexto ke Asmîn resena taxa xo tenya Welîyo gêj bi nê halê aye arqilîyeno û heta keye aye reyde şino. Labelê bi nê şîyayîşî vatvatê cîranan û derûdormeyî dest pêkenî:

“Senî yew cinîke mêrdeyê xo ra remena û yena mîyanê hende şarî de sey camêrdan tena nişena ro? Senî gêjê taxe kuweno aye dima? Ê senî bêedebe musade kena ke destanê aye pêbigêro? (...) Na cinîke muheqeq bênamuse bîya. Mêrdeyê yew cinîke her roje pirodo kî cayê cinî leye mêrdeyê xo bî. Ney, ney! Na cinîke muheqeq gêj a. Eke gêj nêbo, qayîte yew gêjî kena?” (Topaç, 2012: 59).

Wexto ke cinîyî seba xo yew cuya bîne bigeyrê û hewl bidê ke awan bikê çimê heme derûdormeyî û komelî her tim înan ser o yo. Çike eke ê zaf tay zî bibo vejîyê teberê sînoranê komelê pederşahîyî no komel bi heme elementanê xo înan dima yo, êdî çimê heme komelî înan ser o gêrenî.

Bar, giranî û sînorkerdişê nê heme çimanê ke hertim cinîyan ser o yê Topaçê, hîkayeya *Bero Sûr* de bi şêkilêkê metaforîkî mojnena ra. Çike na hîkaye de karaktera bêname beno ke sey temsîliyetê heme cinîyan, zafê zifqêran ra beno ke heme ê zifqêrê ke komelî cinîyan rê qedexê kerdî, înan ra vîyarena û şona. Na karaktera bêname şîna ê “berê sûrî yê qedexeyî” akena û ci ra vîyarena ke êdî aye verê nê “berê sûrî” de ney peyê ci de ya: “Ez peyê yew berê sûrî der a. Bero ke cinîyan rê qedexê yo” (Topaç, 2012: 27). Seke aseno Topaçê nê kitabê xo de derûdormeyê ê sînoranê ke cinîyan dorpêç kenê, ê xet û zifqêrê sûrî yê ke înan rê qedeyê de gêrena û hîkayeyanê nê sînoranê dorpêçkerdayan nusena.

2. 3. Menewşî

Hîkayeyê nê kitabê Topaçê mabênê serranê 2012, 2013 û 2020î de Kovara *Şewçila* û *Vateyî* de weşanîyayê. Hikayeya *Menewşî* zî reya verên nê kitabî de çap bîya. Nê hîkayeyê Topaçê zî reyna dinyaya cinîyan ra komhîkayeyî yê. Nê hîkayeyan de zî Topaçê a dinyaya cinîyan ya nimita û

dejanê înan eşkera mojnena ra. Nê kitabî de hecmê hîkayeyanê aye hîna hîra bîyo û her yewe de seke dinyaya cinîyan ra yew parçeyê bînî mojnena ra.

Hîkayeya *Qîrîya Şabîyayîşî* de cînselîya cinîyan a ke mîyanê edebîyatê kurdî de zaf zêde nêameya mojnayîş û nusîyayîş, nuştuxe bi ziwanêkê metaforîkî a dinyaya nimitaya peyê beran, şewanê tarîyan, binê lihêfan bi heme dej û îhmalkerdîşanê hîsîyan mojnena ra. Karaktera bename ya hîkaye herçiqas qedera “maye û wayanê” xo bişikna û wayîrê yew ewnîyayîşîyê cîya yê xoserî biba zî; dimayê cînselîya xo de biba zî reyna zî wexto ke maya aye yena vîrê aye a şewa aye ya şabîyayîşî de zî hiş û binhişê aye na qedera kehen û hempare anê vîrê aye. Sey kerdîş demê nikayînî de, a hîna xoser û azad biba zî binhişê aye de heme ê rolê cînsîyê komelkî yê ke hetê maye û pîyî ra ameyê musnayene na şewa şabîyayîşî de zî sey xeyaletêk fek aye ra vera nêdanê.

Hîkayeya *Eşkefte* herçiqas yew hîkayeya terteleî biba zî na hîkaye sey zafê berhemanê edebîyanê ke behsê terteleîyê Dêrsimî kenê nîya. Çike herçiqas na hîkaye yew hîkayeya terteleîyê biba zî bala ma ancena yew dejê bînî yê terteleîyê ser. No het beno ke mîyanê edebîyatê kurdî de qet nêameyo mojnayene. Cinîyê na hîkaye, Xane, Nure, Xaskare, Sarva, Guluzare yê. Bi vatişêkê bînî cinîyê kîncîyayî yê. Nê cinîyê kîncîyayî di reyî, mexdûrê terteleîyê yê ke qewmê înan zî rîyê xo înan ra açarnayo û ê mîyanê xo ra qewirnayê.

“Êdî mi rind fehîm kerdêne ke vîyarteyê mi zî sey heme cinîyanê kîncîyayan mabênê adirê terteleîyê de veşaybî. Wele bîbî. Hewnê ma pêro talan kerdîbî. Kesî ma rê berê xo anêkerdêne. Kesî yew çekuya rinde nêvatêne. Çike terteleîyê dolê xo verdaybî mîyanê şeqanê ma. Qewmê ma hêrs û heyfê birînanê xo ma ra girewtêne. Seke suçdarê terteleîyê ma bî. Seba ke ma solix girewtêne ma suçdar bî. Qey wexto ke dişmen pêşkarê ma bî ma xo nêkiştîbî? Qey ma mabênê şarî de bêar gêrayêne? Qey ma erdê Xizirî bi helmê xo qilêrin kerdêne? Qey? Qey? Qey?” (Topaç, 2020: 19).

Seke nê persanê ke karaktera hîkaye persena û hetêk ra zî cewabanê ci dana (esasê xo de nê cewabî cewabê komelî yê, çimê komelî de sebebê suçdardîyayîşê înan o) rewşa nê cinîyan mojneno ra. Ê hetêk ra talankerdişê heme cematî de amey talan kerdîş û tecawuz kerdîş labelê hetê bînî ra zî seba ke înan nê talankerdişî de reaksiyonêk nêmoto ra hetê komelî ra mîyanê cematî de yenê aforoz kerdene. Êdî cayê înan mîyanê cematî de çînîyo, erdê baw û kalan yo pîrozî ser o înan rê sitareyêk çînîyo. Çike yeno bawerkerdene ke ê “herimîyayî” û her ke nê “erde pîrozî” ser o gêrenê nê erdê pîrozî zî herimnenê. Na mesela mîyanê şeran de meseleyêka zaf

têmîyankewta ya ke ewro zî badê zafê îşgal û şeran, vejîyena meydan. Cinîyê ke hetê eskeranê dişmenî ra yenê tecawuzkerdene yan zî înan ra pîze nêweş manenê û gedeyan anê, mîyanê cematî de rewşa nê cinîyan û ê gedeyanê “dişmenan” do senîn bibo? Seke na hîkaye ra zî aseno cayê nê cinîyan mîyanê komelî de çînîyo. Çîyo ke înan ra yeno pawitene ganî înan xo bikiştêne labelê ganî nêverdayêne ke eskeranê dişmenî destê xo bisawitêne înan. Coka zafê metnanê edebîyan de zî ma vînenê ke cinîyê kurdan seba ke nêkewê destê eskeranê dişmenan xo kişenê. Sey nimûne romanê *Kilama Pepûgî* de cinîya Zeynelî Xece seba ke nêkewa destê eskeran misayîbê xo ra û badê cû vistewreyê xo ra vana ke o aye bikişo. Xece hemîla ya zî labelê bi waştîşê aye vistewreyê aye Welî, aye kişeno. Badê cû ma vînenê ke dewijî sey qehremanîyêk behsê nê meseleyî kenê û wina zerrî û diyax danê Zeynelî (Yıldız, 2024: 1080). Seke aseno sey qayîdeyêkê komelkî mîyanê cematê kurdan de na rewşe ronîştaye, nê rewşan de cinîyî bi xo, mergî danê xo ver labelê na hîkayeya xo de Bedrîye Topaç neynika xo açarnena cuya ê cinîyanê ke nê talan û tecawuzkerdişî ra sax feletîyayê û ciwîyenê. Labelê nê cinîyî mîyanê cematî ra ameyê qewirnayene û coka ê koyan ser o zereyê eşkeftêk de pîya ciwîyenê û paştî danê yewbînan, xoverdayîşê cuye danê.

Hîkayeya *Cinîyê Dicle* cinîyanê yew dewr û dewranî rê seke şîwareyêk a; ê cinîyê ke deyîranê cinîyanê azadan vanê. cinîyê ke hêzê xo, hêzê azadî û deyîranê xo awa Dicle ra gênê. Nê cinîyî wexto ke verê ganî de yê Dicle vengê înan dana û seke seba înan merasîmêk amade bika, seba ke reya peyêne biba veng û vajê înan hîna bi heybet, bi hêrs û lêl herikîyena. Na hîkaye de yew şewa ver bi wisarî ya ke êdî zimistan hêdî-hêdî wisarî rê rayîr akeno yo. Vewra koyan êdî helîyena û bi des rojî yo ke varan bêrabên û bi şîdet vareno coka herikîyayîşê awa Dicle zî zaf bedilîyayo. Na şewa ke her kes nê şîdetê varan û herikîyayîşê Dicle ra terseno. Labelê dapîra karaktera bênameye, na şewa mîstîk û xofîne de sey çîlayêk a. Verê cû înan rê deyîre û estanekan vana. Badê cû torina xo (karakterê bêname ya hîkaye) reyde derheqê Dicle de qisey kena. Aye ra vana ke Dicle ra meterse û aye fehm bika. Labelê torine vana ez aye fehm nêkena, ti senîn aye fehm kena. Dapîre vana ke “Wextê to ke ame ti zî bermayîşê aye hesnena” (Topaç, 2020: 35). Nê mabênî de dapîre xo bi xo seke kîştaye aye de yewêka bîne biba qisey kena, “Erê. Wext ame. Ez erey nêmanena” (Topaç, 2020: 36). Wexto ke torine nê halê aye ra tersena û persena aye vana, “Mî to ra vat ya, a maya ma ya. A şîwara cinîyan ra qefilîyaya. Cinîyê Dicle veng danê mî” (Topaç, 2020: 36). Wexto ke torine reyna qisayanê aye ra çîyêk fehm nêkena, “...wext ke ame Cinîyê Dicle veng danê to zî. Çike ê kesane bîaqîlan ra hes kenê. Nika şo rakewe” (Topaç, 2020:

36). Serê sibayî karaktere vîna ke dapîra aye merda. Cinîyê ke ziwanê xoza zanê û xoza reyde benê yew no yewbîyayîş û temambîyayîşê înan bi ziwanê yewbînan ra fehmkerdişî ya tamam beno.

Hîkayeya *Şewa Sipîye* derheqê rojanê sipîyanê zimistanî yê ke heme rayîrî yenê girewtene de ya. Nê rojanê sipîyan yê meheyrîye de zimistan xezebê xo varneno însanan ser. Bîlhesa ê însanî yê ke tengasîye de yê, verê ganî de yê, nêweş û diganî yê. Zafê cinîyan seba ke doktor û nêweşxane çinîyo, wexto ke gedeyan anê mirenê, na hîkaye zî seke qeder û emro kilm yê nê cinîyan rê şîwareyêk a. Na hîkaye hetê munitîşî ra zaf tesîrdar a ke goreyê ma nê tesîrdarbîyayîşê xo vatoya xo ra gêna. Na hîkaye de vatoya şexsa yewin a û ma çîmanê aye ra û hîsanê aye ra herikîyayîşê hîkaye vînenê. Cinîya ke tengasîya gedeyî de manena û mirena cinîya birayê na karaktera bênameya şexsa yewine ya. Badê cû ma fehm kenê ke na karaktera şexsa yewine zî nîşanbîyaye ya û na reye tersê heman qedere yeno nişeno milê aye ser o zî. Esasê xo de no ters tenya tersê ganê aye nîyo. Tersê merg û tengasî de mendişê heme cinî û veyvekanê destheneyan o.

Hîkayeya *Menewşî* ya ke nameyê xo dayo kitabî, hîkayeyêka eşqî ya. Na hîkaye heto naîf û nermî yê eşqî mojnena ra. O eşqo ke sey vilikanê menewşe xasek, teza û omîdwar o. Labelê hetêk ra zî qasê a cinîya ke peyê şîbaka “ê keyeyî” de peyê caxan ra ewnîyena teber ra sînardar û tarî yo. Na hîkaye bi teswîrê yew dikanê vilikan dest pêkena, mêrikêk wazeno qevdêka vilikan biherîno. Û dîyaloxê ey û wayîrê dikanî ra dîyar o ke no mêrdek her roja yewşemeyî yeno nê dikanî ra qevdêka vilikan herînenê. Hema ma nê teswîrî de hîsdrîya mêrdekî vînenê ke o bêhîs û bi destanê qebayan vilikan qevdkerdişê dikandarî ra eciz beno. Goreyê ey ra no têwgêrayîşê dikandarî seba vilikan zulmkerdiş o. Badê nê zulmkerdişî wexto ke o vilikanê xo gêno û dikanî ra vejîyeno ver bi ê rayerî şîno û peyên de reseno wayîra vilikan. Wayîra vilikan verê pencera de pabeyê ey a. Ma teswîrê cilanê cinîye ra fehm kenê ke na cinîke “karkera seksî” ya. Pencera ver o ê menewşî yê pilosîyaye yê hewteyê bînî estê û mêrdekî ê taze yê nê hewteyî ardê. Yewbînan vînayîşê înan hende yo, qasê awirêk, qaso ke vilikan teqdimê cinîke biko wextêko teng û peyê caxan de eşq bi heme bêsinorîya xo herikîyeno. Labelê agêrayîşê mêrdekî de no eşq, na dinyaya bêîmkane sey ezab û cehenemê rastîya xo mojneno ra.

Her di kitabên xo yê hîkayeyan de zî Bedrîye Topaçe dinyaya cinîyan ra cuya cinîyan ra gamanê cîya-cîyayan mojnena ra. Seke aye neynikêk aye dest de wextanê tarîxkîyan de, dewrê ewroyî de, mîyanê cuya rojane de, dewan de, bajaran de her neslî ra, emrî ra cinîyan mîyan de gêrena û cuya

înan ra parçeyanê cîya-cîyayan mojnena ra û bala ma ancena problem û derdanê înan ser. Hîkayeyanê Topaçe de çîyêko balkêş zî uslubê aye yo. Bîlhesa kitabê *Menewşî* de nuştuxe o uslubê xo yo şîrkî dewam kerdo û hîna aver berdo. Teswîrê aye hîna hîra, tesîrdar û baş ê. Beno ke coka tayê hîkayeyê nê kitabî, sey hîkayeyanê *Xeyal* û *Pencera* tahmê şîrêka serkewta de yê.

2. 4. Vîndîbîyaye

Lorîn Demîrel serra 1985î de Dêrsim de maya xo ra bîya. Manîsa de ekonomi wendo. Unîversîteya Mardîn Artuklu de seba kurdî kursê lektorîye wend. Serra 2016î de heman unîversîte û beşî de masterî xo qedîna. Heman serre de Unîversîteya Munzurî de beşê zîwan û edebîyatê tirkî wend. Nuştayê aye *Newe de Dêrsim*, *Azadiya Welat*, *Tîroj*, *Zend* û *Bass News* de ameyê weşanayene (Özkan, 2024: 77). *Vîndîbîyaye*, kitabê hîkayeyanê Lorîn Demîrel o (Demîrel, 2014). Bê nê kitabî sewbîna kitabê nuştuxe çîniyê. Nê kitabî de new hîkayeyî estê. Hîkayeyanê xo de Demîrel tarîxî ra û şexsiyetanê tarîxiyan ra zaf zêde îstîfade kerdo. Hîkayeya *Saya Herame* de Feqîyê Teyran ra, hîkayeya *Demê Qeçaxçîyan* de Şêx Seîd û Yadoyî ra, hîkayeya *Hardo Dewrêş Şahîd o* de Evdalmusayî ra tesîr girewto û serebûtê înan sey hîkaye nuştê.

Tayê hîkayeyanê Demîrel de cinîyî rasterast sey karaktera sereke yê. Hîkayeya *Gaxan* de, wext zimistan o û şar roşanê Gaxanî pîroz keno. Yew xorto xerîb o ke dekwto hîkayeya maya xo dima, yeno na dewe. Maya nê xerîbî 38î de domane bîya û bi şekilêk xelisîyaya û şîya Îzmîr. Domananê xo rê qet behsê vîyarteyanê xo nêkerdo. Labelê wexto ke êdî pîr bena, ganî ver de, heme doman û torinanê xo ana pêser û înan rê behsê hîkayeya xo kena ke a bi çîmanê xo reyêk zî bibo şora dewa xo bivîna. No xorto xerîb zî na mintîqa de mamosta yo û seba ke na dewe bivîno ameyo. Na cenyeka îxtîyare, Elîf Xanime, badê serran yena war û erde baw û kalan. Pîrêk yeno û ê gulbang girê danê. Badê çend rojan cenyek tîya de mirena û mezelê aye zî tîya de virazenê. Na hîkaye de yew cinîya bîne ya ke dimayê erd û warê baw û kalan de agêraya Meryema armenî ya. Meryem keyeyê xo reyde 1915î de surgun bîya û şîya Amerîka. Labelê badê serran zî bibo agêrena: “Naye ra vîst serrî ver domananê xo ra heqa xo girewta ameya dewa maye û pîyê xo” (Demîrel, 2014: 14). Na hîkaye de ma cinîyanê ke mexdûrê hedîseyanê tarîxkîyan ê vînenê. Çiqas wext ser ra vîyaro zî rastîya tarîxî giraneyê nê cinîyan vera nêdanê ê heta ke reyna tarîxî de nêbêrê tê rî nêşkenê na dinya ra bar bikê û şorê.

Hîkayeya *Vîndîbîyaye* de karaktera sereke yew nesilê hîna neweyî ra ya û kewta ziwanê xo dima. Na hîkaye de o çîyo vîndîbîyaye ziwan (kirmanckî) bi xo yo. Karakter ferq kena ke aye êdî ziwanê xo nêzana: “Maya mi naye ra hîrê-çar aşmî raver telefon de xalika mi de qisey kerdêne. Labelê mi qiseykerdena maya xo ra fahm nêkerdêne. Ez o wext fikirîyaya ke çira ez nê ziwanê xo ra çîyê fahm nêkena. Ez ke şîyêne dibistana verêne, o wext mi ziwanê maya xo de qisey kerdêne” (Demîrel, 2014: 22). Nika na karaktere vîst û panc serra ya û goreyê vatişê aye, aye bî des û heşt serrî yo ke ziwanê xo vîndî kerdo. Na hîkaye de na rewşe bi şekilêkê metaforîkî ameyo mojnayene. Çike karaktere şina qerekol ke îlanê vîndîbîyayîşê ziwanê xo bida. Labelê uca de cinîyêk nas kena ke aye verê aye açarnena kokanê aye ser û aye dimayê nê ziwanî de şina Dêrsim.

Hîkayeya *Qendîl* de zî reyna meseleyêkê ziwanî û ferqê mabênê nesilan esto. Labelê na reye dapîra ke tirkî nêzana wexto ke televizyon temaşe kena seke bêziwan a. Reyna torina aye zî seba ke kirmanckî nêzanê na dapîre înan reyde zî nêşkena qisey bika. Tenya torina aye ya pîle kirmanckî zana û aye dapîre rê televîzyonî ra her çî açarnena. Tenya wexto ke dapîre dej û kulanê kurdan ser o televîzyonî de çîyêk bivîna, ziwan nêzana zî, ê dejê hemparî hîs kena û fehm kena.

Hîkayeya *Persa Xelete* de Demîrel bi çîmanê kesê dîyinî ra bi ziwanê “ti” yî hîkayeya xo munita. Na vatoxa kesa dîyine sey “ti” hîtabê cuya qehremana hîkaye kena. Na qehremane badê di lajan bi niyaz, dua û ad û wadê zîyaran ameya dinya ke maye zaf waştî yew kênaya aye biba, leyê aye de bimana û îxtîyarîya aye de dest bierza aye. Labelê na kênaya, Sultane, her ke bena pîle hesretê rayeranê duran ancena û xeyalanê cuyêka bine kena. Sultane wazena mekteba xo dewam bikera û seba lîse şora wîlayet. Labelê maye nêwazena kênaya aye, aye ra dûrî şora. Pîyê aye mecbûr maneno ke xeyalanê aye dima şoro û cinîya xo zî îqna keno: “Erê Xanê hala vinde peynîya nê xeyalê çêna ma ra çi vejîno. Eke va ez wanena şona wîlayet ma se vanîme? Her roj henî kitab dest de fetelîna. Olvozan dest de kar çêna ma dest de kitab...” (Demîrel, 2014: 71). Kêna bi ê şekilîya seba lîse şina wîlayet na rewşe seba dewe çîyêko newe yo ke kênayêk keyeyê xo ca verda û şora. Sultane wexto ke dest bi lîse kena tîya de reya verêne bi tayê çîyan pêarqilîyena. Zafê embazê Sultane sey aye dewan ra ameybî labelê ê ke wîlayet ra ameyêne zafane domanê esker û polîsan bî. Nê wendekarî ziwanê înan sey “ziwanê dewijan û ziwanê koyan” name kenê. Ê wexto ke wina vanê Sultane ziwanê xo ra şermayena zor dana tirkî. Ferqê tewr girdî wexto ke beno tetil û Sultane yena dewe ferq kena.

“Ber ra ke kewta zere qet zereyê to nêşî ke solanê xo bivejerê, şêrê keyeyê xo. To mayê inan dibî, çiqas rindek bîy. Etege rindekî girewtêne pira. Porê xo zaf rindek şane kerdêne. Sey cinîyanê dewanê şima nêbîy. Ti ke maya xo verê lojine de diye ti zereyê xo de va ‘nê dayê ez sey şima nêbena. Ez sey şima lojine ver de zere wela adirî de nêpoyîna, nêmirena” (Demîrel, 2014: 76).

Wexto ke aye badê aşman agêrena keyeyê xo, maya aye xof dana aye. A tersena ke do qedera maye bibo qedera aye zî. Seke Murdock bala ma ancena ser kes maya xo sey qedera xo vînenno (Murdock, 2023: 188). Reyna Murdock bala ma ancena ser ke arketîpê maye di hetanê ke ekse yewbînan ê temsîl kena: maya baş û bêqusur a ke eleqe, seveknayîş û muhafizekerdişê bêsînori temsîl kena; maya xirab a ke xof dana merdimî, xeniqnayîş, fetisnayîş, zerrîtengî û mergî temsîl kena (Murdock, 2023: 44). Na hîkaye de zî maya ke bi heskerdiş û seveknayîşêkê bêsînori kêneya xo ra hes kena êdî çimanê kêna de bîya yew kesa ke kêna qedera aye ra xof gêna temsîl kena û kêna na qedere ra remena. Coka êdî mekteb û wendiş seba Sultane bîyo temsîl û sembolê cuyêka bîne. Goreyê aye heme nê apeydemendişî nê zîwan û cûya dewe ra yê ke a bi xo êdî bi ewnîyayîşêkê self-oryantalîstî ewnîyena derûdormeyê xo ra. No halê aye bala maye, pî û birayanê aye zî anceno. Beno ke coka verê ke aye agêra mekteb birayê aye, aye ra vano, “Nîyade wayê, ma kurd îme, elewî yîme. Ez zanena ti hona ciwan a labelê xo rind bizane!” (Demîrel, 2014: 76). Bi nê qisayanê birayê ke sey îqazêk ê, a vînena ke haya her kesî bi aye esta. Labelê wexto ke aye agêrena mekteb verê cû şina yurd de bi şampuanî, xo mirdîya xo şuwena ke boya dewe aye ra şora.

Badê cû Sultane İstanbul de unîversîte de mamostatî qezenc kena û wazena şora. Labelê reyna maye nêwazena ke kêneya aye hende dûrî şora. Birayêkê aye, aye reyde erşawenê, ê şinê keyeyê datê xo de manenê. Labelê tîya de zî Sultane roj bi roj her kesî ra dûrî kewena û rojêk bira aye ra “Ti êndî vurîya. Halê to hal nîyo. Şodir urzîme şime dewe. Êdî na raya to qedîya” (Demîrel, 2014: 79) vano. Sultane badê nê qisayanê birayê xo şewe wurzena, pereyanê birayê xo û apê xo, zerdanê najnîya xo gêna û keye ra remena. Êdî seba ke birayê aye, aye nêvîno nêşina mekteb zî. Xo rê Beyoglu de odayêk kîra kena û uca manena. Badê yew serrî bi xebera ke maya aye ganî ver de ya qerar dana ke şora dewe. Labelê êdî o rîyo ke aye neynike de vînena nêzana ke a kam a:

“Neynike de xo de nîyada rîyê xo de çim û bûrîyanê xo de, sereyê xo de. Zelalî û delalîte to bîya awe, lapa to ra rîjîya gina qanalîzasyonê İstanbulî ra. Zereyê qanalîzasyonî de awa qilerîne zêde

ya, awa destê to pak a, çitur uca de pak bimano, a kî bîye qilerine. Qilerê şaristanî zaf o pakîya to şenik... Nê bajarê girsî to qedena, to ra çike esto qedena” (Demîrel, 2014: 80).

Seke aseno êdî seba Sultane xerîbîyêk esta ke aye neynike de xo nêşinasnena. Seba ke a reyna bieşka neynikan de xo bişinasna seke agêra kokanê xo ser, agêra a qedera ke a ci ra remayêne û a qedere de bêra têrî. Çike Murdock îzeh kena ke seba ke karaktera cinîye raywanîya xo tamam bika ganî aye maya xo de werê bêra û visîyayîşo ke mabênê kêna û maye de yo berteraf bibo (Murdock, 2023: 26). Aye zî seba ke na raywanîya xo tamam bika agêrena dewa xo, kes aye ra çîyêk nêvano, sey verî aye dawetê keyeyî û mîyanê xo kenê, wexto ke şîna odayê xo zî vînena ke odayê aye sey verî pabeyê aye yo. Seke aseno na hîkaye de Demîrel yew hetê bînî yê cuya cinîyan moto ra. Wendiş, xoaverberdiş, karêk vînayîş û xebitîyayîş seba azadîya cinîyan helbet merheleyê destpêkî yê muhîmî yê. Labelê wexto ke karakterî cuya xo, derûdormeyê xo, şert û mercanê cematê xo baş nêzanê û cuyêka bine îdealîze bikê, no îdealîzekerdişo bêbinge sey heyelanêk heme erd o ke binê linganê înan de yo, binê linganê înan ra beno û ê bêkok ginenê erd ro. Tîya de sey çare reyna agêrayîş ameyo mojnayîş û şansê Sultane beno ke tîya de no bibo ke no kêbero ke aye agêraya ci heme berê xo heta peynîye aye rê akêrdê. A maye de werê yena û maye seba aye bena eleqe, seveknayîş û muhafezekerdişêko bêsînor.

2. 5. Hêvîya Macire

Burçîn Bor serra 1989î de Çewlîg de maya xo ra bîya. Hewt serrîya xo de şîya Almanya û uca de tehsîlê xo kerd. Bor verê cû bi nameyê Zerîn Azrawa, serra 2011î de, rojnameyê *Newepelî* de dest bi nuştîşî kerd û kovara *Şewçîla* de nuşttoxîya xo dewam kerd. Kitabê aye yo hîkayeyan *Hêvîya Macire* serra 2013î de weşanîya. Nê kitabî de 13 hîkayeyê aye estê. Nê hîkayeyan de zî cuya cinîyanê welatî ra, înan ke koç kerd Almanya cuya înan yê koçî ra û cuya înan ra parçeyî estê. Hikayeya *Roja Sîyaye* bi dîyaloxanê qijkekan trajedîya cinîyan yê ke kênayê înan estê labelê lajê înan çinîyê, derheqê înan de ya. Na trajedî bi dîyaloxanê mêrdekêk mojnîyaya ra ke o na rewşe û roje sey “rojêka sîya” name keno: “Erê xalkêna, mi vatên mi rê yew laj ho beno, laj! Cinîya mi ewro bîye weşî, kêna arda, kêna. Wa ez bimerdêne mi ina roja sîya nêdîyen!” (Bor, 2013: 11). Seke aseno na temaya hempar a ke zafê hîkayeyanê hîkayenuşttoxanê cinîyan de ameya mojnayene bala Bore zî anta û aye zî bala ma ancena nê problemê komelê pederşahî ser o.

Hîkayeya *Xuy* cuya cinîyanê ke xo cuye ra ancenê, cuya xo teng kenê û tenya heme cuya xo bi kar û gureyê keyeyî xo rê kenê xayîle û armancê na dinya, behsê înan bîyo. Qehremana hîkaye wendiş ra û kitabana ra zaf hes kena labelê maya aye seba ke derheqê pakî û pakkerdişê keyeyî de zaf hesas a û cuya xo bi nê çî teng kerda kitabana sey barê pakkerdişê vînena. Labelê kêneya aye, aye rexne kena ke aye lîse qedênaya la cuya xo sînordar kerda û xo qet aver nêberda, coka ganî kitabana biwana. Labelê maye kovara ke kêneya aye daye aye ra tenya qismê pakî wanena ke sey îronîyêk rewşa maye ameyo mojnayene.

Hîkayeya *Fatima û Helga* sey îronî û trajedîyêk rewşa cinîyanê “almancîyan” mojnena ra. Na hîkaye de ma zewacê *Fatima* û *Adirî* vînenê ke verê ke *Adir* şoro Almanya zî zewacê înan tehdâ, heqaret û xezebê *Adirî* ser o awan bîyo. Fate bi hêvî û xeyalanê zaf girdan *Adirî* de zewicîyaya labelê badê zewacî *Adir* sey nameyê xo bîyo xezeb û keyeyî ser o vareno. Fate hem karê keyeyî kena hem zî seba debara keyeyî cîranan rê cil-milan derzena. Labelê reyna zî çîyo ke a vînena heqeret o, “Biewnî, mi meya uja haa! Senî zîwanê to bîyo derg. Ti sey dele zon kena...” (Bor, 2013: 19). Fate sey zafê cinîyanê kurdan seba keye û gedeyanê xo na rewşe ancena sîne “Kerra bîyêne a zî helîyêne, lakim cinîyê ma, qijkekîya xo ra musenê ke barê dinya wedarê” (Bor, 2013: 19). Fate zî nê barî heta ke aye dest ra yeno wedarena. *Adir* bi xapênayîş zerdanê aye, aye ra gêno ke şoro Almanya. Labelê bi şîyayîşê ey zî derd nêqedîyeno. O reyna aye ra wazeno ke ey rê peran bîrşawa û a şora mehkema ey ca verda ke o uca de seba heqê ronîştîşî bizewicîyo. Fate naye zî kena û dima qasê wextêkê dergî veng ey ra nêvejiyeno. A gedeyanê xo tenya kena pîle. Rojêk *Adir* aye rê telefon keno ke o û cinîya xo ya Alman *Helga* do bêrê welate labelê Fate sey waya xo mojneno ra. No *Adir* o ke Fate rê yeno xezeb *Helga* rê sey pisîngêk o her xizmetê na cinîya ke emrê maya ey de ya keno. Bi na derba peyêne ya *Adirî* Fate keye ca verdana û şîna pîyê xo ra vana ke wa o melayêk ra vajo ke o aye ca verdo.

Hîkayeya *Hêvîya Macire* yew hîkayeya ke derheqê trajedîya koçberî de ya. Qehremana na hîkaye Hêvî Almanya de keyeyê cinîyan de xo nimito û ma hîkayeya aye vînenê. Hêvî Çewlîg ra ya, a û mêrdeyê xo uca de mamosta yê û rewşa înan zî baş a. Labelê rojêk mêrdeyê aye seba meseleyanê sîyasîyan benê îşkence û cuya înan serûbin bena. Badê zafê tehdayan ê mecbûr manenê ke koçber bibê. Verê cû mêrdeyê aye koç keno Almanya badê cû aye bi hezar zehmetîyan (mîyanê destanê sîmsaran de şerpeze bena, diganî ya rayer de pitika aye mirena, di gedeyê xo welat de verdayî) xo resnena Almanya. Labelê tîya de ê nêşkenê ê rojanê xiraban xo vîr ra bikê û adapteyê cuya xo ya

newa bibê, her ke şino cuya înan hîna bena xirab, mêrdeyê aye beno alkolîk, kêneya aye ya pêlê keye ra remena, a bîne zî dewleta Almanan înan ra gêne, Hêvî zî mêrdeyê xo ra remena şina keyeyê cinîyan. Tîya de Hêvî herçiqas cinîyêka wenda zî biba zafê meseleyan de wayîrê ewnîyayîşêkê tradîsyoneli ya: “Vanî, cinî nêmlaçik a... Ez nêmlaçike, vistewreyê mi zî bêzar bêziwan, ma ûna kewtî reyarê Ewropa.” “Ez şarmeyayne vistewreyê xo ra zî vacî ke ez diganî ya, zerrîya mi şina çî-mî!” (Bor, 2013: 34). Seke aseno a zafî reyî cinîbîyayîşê xo ra şermayena û qij vînena ke cinîyêk bieşka tenya sereyê xo zaf çîyan hel bika. Herçiqas zaf reyî xoverbida zî nêşkena hemverê cuya de pay ra vindera.

Hîkayeya *Vînbiyayîşê Zîne* derheqê cuya yew kêneya ke koçberê Almanya biya de ya. Zîne qeçekîya xo ra maye û pîyê xo reyde şîya Almanya labelê pîyê ci beno sebeb ke aye nêşka adapteyê na cuye biba û xo aver bera. Labelê qeçekîya xo ra aye zaf bîaqil û serkewta ya ke heme embaz, mamosta û derûdormeyê aye, aye bi engîşte mojnênê ra. Labelê tenya pî Zîn nêvîneno û hemverê aye de bêeleqe yo. Çike, “Pîyê aye mela xemilnayîşê xo dima bi: zimbêlî her roje rûwen kerdên, porê xo boye kerdên, bi saetan şane kerdên, qatê kincanê xo dayên xo ra, tîzbîya xo ya kehrîbare kerdên xo dest a, zimbêlê xo kişt a tadên û niştîyen otomobîla xo ya Mercedes, yallah qewe yo ti hê kamca de!” (Bor, 2013: 43). Heman pî wexto ke Zîn seba lîse wazena şora bajarêkê bînî nêverdano vano pereyê mi çinîyê ke ez to bîrşawa. Xora goreyê ey zaf zî muhîm nîyo ke Zîn şora mekteb yan zî serkewta biba, çike, “mi de pereyî çin ê, ez nêşkena to bîrşawî, hîn hend to wendo bes o, binek zî keye de maya xo rê alîkarî biker, kar û gureyê keyeyî bimuse. Sîba ra bîr ti bena wayîra keyeyê xo, ti nêmusî, ti senî eşkena miqateyê qijanê xo û mêrdeyê xo bibî, no zî sey wendişî yo” (Bor, 2013: 44). Seke aseno Zîn herçiqas zaf bîaqile û serkewta biba zî seba pîyê aye erjê komelê pederşahî hîna muhîmî yê. Yew cayêko sey Almanya de Zîn bi heme bîaqilî û serkewtebîyayîşê xo zî nêşkena hemverê nê sîstemî de vindera. Pî qasê serrêk aye zereyê keyeyî de dekeno zereyê qefesî û sey bekçî ser o vindeno. Badê serrêk o nîyetê xo eşkera keno ke kêneya xo bido embazê xo Zîlfî yo ke sey finansorê eyî yo. Zîn na rewşe de reaksiyonêk mojnena ra û orte ra vîndî bena. Labelê ma qisayanê peyênan yê nuştuxe ra fehîm kenê ke Zîn sey hezaran kêneyanê kurdanê ke Ewropa de yê, kuçanê Ewropa de vîndî bîya û dekewta mîyanê çamûrêk (Bor, 2013: 45).

Hîkayeyê *Vileyê Xerîban Çewt o û Xururê Yew Nîjadperestî* derheqê cuya Almanya ya ke şaro xerîb mexdûrê nîjadperestîye yo. Nê her di keyeyan de zî qehremane yew elemana weşîye yan zî

ciewnîyayîşî ya ke şina keyeyan de tedawîyê îxtîyaran kena labelê heqeretê nîjadperestî bi aye yenê kerdene. Reyna na karaktere zî cuya tîyayî sey cuyêka qilêrine vînenê û seke adaptebîyayîş seba aye zî zehmet o. Hikayeya *Gula Xalfetî* zî rewşa ê cinîyanê ke sebebanê sîyasîyan ra koç kenê û şinê Ewropa uca de tekûtenya manenê derheqê înan de ya. Na hîkaye de zî Zîlana ke seba meseleyanê sîyasîyan ra koç kerdo Ewropa uca de komel û kesanê kurdan ra paştî nêdîya û kuçeyan de bê keye menda, rewşa aye mojnena ra. Seke aseno qehremanê Burçîn Bor Ewropa de zî sîya zafê meseleyanê sîyasîyan ra û ewnîyayîşê camêrdanê pederşahî ra nêşkenê adapteye tîyayî bibê û xo rê cuyêka azade awan bikê.

Hîkayeya *Muptelayîye* derheqê yew kêneya ke her roj neynike ver de bi rindîya ecêbmayî xeyalanê rojêk zaf zêde biba namdar de ya. Bi şêkilêkê îronîkî ma trajedîya na kêna vînenê ke hende derûdormeyê aye rê çimê aye bîyê korî, şamîya ke maya aye adirî ser o emanetê aye kena vêşena û tayê maneno aye zî zereyê keyeyî de bivêşa.

2. 6. Zeman Sey Fekê Kardî Bî (Hîkayeyê Koyî)

Şeyda Asmîn, serra 1977î de Gimgim de maya xo ra bîya. Rojnameyê *Newepelî* û kovara *Şewçîla* de zaf nuşte û hîkayeyê aye weşanîyayê. *Zeman Sey Fekê Kardî yo (Hîkayeyê Koyî)* kitabê hîkayeyanê aye yo (Asmîn, 2013). Nê kitabî de destpêk de çarêş hîkayeyî estê; binbeşê *Hîkayeyê Koyî* de zî des hîkayeyî estê.

Hîkayeyanê Şeyda Asmîne de cuya cinîyan ra zaf hetanê cîya-cîyayan ra panoramayê balkêşî estê û ameyê mojnayene: Kênayê ke mektebanê leylîyan de manenê û uca de tehda û asîmîlasyon o ke vînenê, ameyo mojnayene. Cinîyê ke sey ê ke apey de mendî zor û zordestîya dewrê xo û tarîxî dîya; înan ke tertileyê 38î dîyo, erdlerzê Gimgimî dîyo, şerê serranê newayan dîyo, ê pêro sey şahid û mexdûrê tarîxî, qehremanê hîkayeyanê Asmîne yê. Cinîyê ke semedê sistemê pederşahî ra neheqî bi înan yena kerdene û nêşkenê cuya xo awan bikê; derheqê cuya xo de qeraran bigîrê; nêşkenê qedera xo bi xo xêz bikê û rayerê xo bi xo roşnî bikê, karakterê hîkayeyanê aye yê. Sey zafê nuştexanê cinîyan hîkayeyanê Asmîne de zî cinîyê ke seba ke gedeyanê lajan bîyarê pê ser o gedeyan anê; û wexto ke kêneyan anê heqeret bi înan yeno kerdene û qij yenê vînayene, sey karakter estê. Cinîyê ke nêşkenê bi waştîş û heskerdişê xo mêrdeyanê xo biweçînê û bi zorê pîyê xo yenê zewicnayene. Cinîyê ke mîyanê cuya zewacî de bi hezar neheqî, tehda û heqeretî bi înan yenê kerdene labelê seba ke cayêkê înan yê şîyayîşî çinîyo nê heme tehda û heqaretan ancenê

sîne. Cinîyê ke mêrdeyê înan merdê û ê vîya mendê û mecbûr mende ke birayanê mêrdeyanê xo de bizewicîyê. Kênayê ke wazenê mektebê xo dewam bikerê labelê nêşkenê pîyê xo ra destûr bigîrê û mecbûr manenê ke na rewşe qebûl bikê. Cinîyê ke hepisxane de peyê xo de gedeyanê xo verdanê yan zî mecbûr manenê ke gedeyanê xo yê qijan xo reyde atmosferê hepisxaneyî de pîl bikê. Asmîne hîkayeyanê xo de cuya nê cinîyan mîyanê atmosferanê cîya-cîyayan de mûnena. Yanî a neheqî û zordestîya wayan, kênayan û cinîyan mojnena ra û hîkayeyanê xo de bi hîsê “wayêk”, “bi ruhê wayîtî” rewşa înan mûnena. Çike nuştuxe mojnena ra ke na qedera hempare ya maye û kênayan a ke maye ra sey emanet û çeyiz kênayan rê manena: “Destê ma ra çîyê nêno Gula mi. Qedera ma pêrunê sey jûmînî ya. Heqê ma çin o, ma derheqê xo de qerar bidîme. Na qedera ma wa. Ma neçar îme ke razî bîme. Qedere de çî nusîyayo ma ê vînenîme” (Asmîn, 2013: 54). Kênayî herçiqas biwazê na qedere bişiknê zî zafane hemverê erjanê komelê pederşahî yê ronayeyî de nêşkenê ser bikewê: “Şade çênayêka bîaqile bîye. Zaf waştêne biwano. Sey ma û pîyê xo mebo. Lê nika qedera Şade bîyêne sey qedera maya aye. Sey cinîyanê ucayî. A kî bidayêne mêrdeyî. Da-des domanî biardêne. Emrê aye feqîrîye de biqedîyayaêne” (Asmîn, 2013: 34). Na qedera ke verê zewacî Şade texmîn kena ke do aye zî biba sey ‘maya xo’ rasta zî wina beno:

“Badê çend aşman xebere ameye ke mêrik dano Şade ro. Serrê kî derbas bîyê Şade bîya wayîra derguşe kî. Şade îndî nêşikîna ca verdo. Pîyê Şade vano tawo nêbeno. Mêrdeyê aye dano piro kî ci ra hes keno kî. Piro dayene raşt a, lê hes kerdene çin a. Heta peynîya emrê aye pirodayene bena sîya Şade, aye qet canêverdana” (Asmîn, 2013: 35).

Nê cumleyanê peyênan yê hîkaye de bîlhesa di çî zaf balkêş ê. O verên zewac o ke binge-yêkê puçî ser o ameyo viraştîş bi gede ardişê cinîyan hîna beno zixm û cinîyî êdî nêşkenê xo cayê xo ra têw bidê. Xora zafane komelo pederşahî nê mîsyon û fonksîyonê cinî ser o zaf zêde vindeno û domanîye ra nê çî musneno kênayan. Seke Beauvoir bala ma ancena ser;

“Adet û toreyî hema ra zî perwerdeyî, kulturî, berpirsîyarîye, aktîvîteyan sey xususîyet û heqê camêrdan vînenê û cinîyan nê xususîyetan ra dûrî tepişnenê. Zemanêk senîn ke hemverê lajan de qijvînayîşê xo, xo vîr ra bikê veyvekêk (oyuncak) dayêne destanê kênayan nika zî gedeyêk danê verika înan; nêverdanê cinîyê bicuyê labelê destûr danê ke ê bi yew gedeyê/a raştikênî/e kay bikê” (Beauvoir, 2010: 161-162).

Na hîkaye de zî peyênî de, Şade bena kırıştoka qedera maya xo û yew parçeyê sistemê pederşahî. Pîyî zî zereyê nê sistemî de pawitoxê nê sistemî yê. Zafê nê hîkayeyanê cinîyan de ma vînenê ke pîyî heman çiyî vanê “bido piro zî mêrdeyê aye yo ” yan zî “yew lepate ra se beno” coka nê cinîyî zereyê cuye de hîna bêhêz û bêpaştî manenê. Çike ê wayîrê sîya yew pîyî yan zî paştdayîşî nîyê ke paştîya xo bişanê pîyê xo. Mayî xora zafane bêhêzî yê û nêke seba kênananê xo bibê setareyêk nêşkenê cuya xo de bîle bibê wayîrê heq û vatişêk. Coka cinîyî hemverê hende zordestî de zî mecbûr manenê ke camêrdan sey setareyêk bivînê û paştîya xo bişanê camêrdêk.

Hîkayeya *Poşmanîya Xase* nê hetî ra zaf balkêş a. Xase yew cinîyêka bi zorê keyeyê xo zewicîyaya. Pancês serrî zewicnaye manena labelê bê heqaret, kuwayîş û hesran çiyêk nêvînena. Badê pancês serran mêrdeyê aye mireno. Na reye derdê debare vejîyeno meydan ke ganî êdî Xase tenya bieşka îdareyê keyeyê xo bika. Hêdî-hêdî musena na dinya zî û xo rê karêk vînenê. Labelê seba ke cuye nas nêkena, seba ke qet heskerdiş nêdîyo û o hîna muhîm seba ke “cinîyêk tenya do se biko” şona mêrdeyê xo ra yewêkê hîna xirabî vînenê ke dekewena mîyanê yew afat û xezebê girdî: “Mi va qey o wayîrê min û domananê mi vecîyeno. Ê komelî de cuya bi tena sereyê xo zaf zor bî. Mi va qey ma rê bibo star. Mi va qey min û domananê mi bicêro binê peranê xo, bisevekno” (Asmîn, 2013: 44). Bi nê ewnîyayîşî cuya xo û domananê xo kena cehenemêk.

Kitabê hîkayeyanê Asmîne de beşê *Hikayeyê Koyî* de ma derheqê cuya koyî ya zehmetine de hîkayeyan vînenê. Nê hîkayeyan de hemverê nê zehmetîyan de cinî û camêrdî sey pê asenê. Ma nê hîkayeyan de cinîyan sey şerwane û serdare vînenê. Ê zî qasê camêrdan hêzdar ê. Na rewşe, seba cinîyanê kurdan rewşêka newa ya ke êdî ê zî meydanê cengî de şer kenê. Bruinessen zî bala ma anceno nê meseleyî ser o, “Komelê kurdan zêde zêde yew komelo pederşahî yo û heme tarîxê ci yo ke yeno zanayîş de zî wina bîyo. Çi esto ke, tarîxê kurdan mîyan de, ma rastê cinîyanê ke ameyê mewqîyanê berzan û mîyanê komelê xo de benê sîyasî heta tayê halan de benê lîderê leşkerî zî yenê” (Bruinessen, 2013: 131). Zereyê yew komelê pederşahî de no rolê cinîyan yo newe hîkayeyanê Asmîne de zî ameyo mojnayene. Hîkayeya *Simzêre* ya ke vatoxe yew simzêr a, nê şaşmendişê xo wina mojnena ra, “Hela ez tawo ke musaya cinîyê gerîlayî kî estê, mi bawer nêkerd. Aqilê mi nêguretêne cinîyî se bêrê serê nê koyan de ceng bikerê. Verde cengkerdişî, ê se bicuyê. La mi nika dîyêne ke rast a. Jûya înan nika verê çimanê mi de bîye” (Asmîn, 2013: 129-130). No hal tenya bala simzêrêk ney bala cendermeyêk zî anceno, “Zanayena Asmîne her şîyêne hînî zîyade bala ey ontêne. Pêşas mendîbî, gerîlayêk hem kî gerîlayade cinîye se şikîyêne serê nê

koyan de hende zana bo. Hînî bîbî ke îndî nêşikîyêne heyranîya xo binimno” (Asmîn, 2013: 151). Labelê nê hikayeyan de zî ma çend reyî rexneyanê nuştoxe ra vînenê ke tîya de zî tayê rolê cinsîyetî yê komelkî eşkenê bikewê mabênê cinî û camêrdan, “Her kes wazeno tewr vernî de bo. Taybetî kî mîyanê cinî û camêrdan de na mesela ser o xeylê lej beno. Ax camêrdî! Her ca de jû yê!...” (Asmîn, 2013: 147). Çike camêrdî sey şerwan zî hevalanê xo yê cinîyan wina vînenê; “Uff şima cinîyî kî zaf kibar ê. Mordem nêşikîno leye şima de qalê çîyê bikero” (Asmîn, 2013: 147-148).

Peynîye

Edebîyatê zazakî de, nuştoyanê cinîyan bîlhesa serranê 2012î û 2013î de kitabê xo yê hikayeyan weşanayê û mîyanê hikayenuştoxîya zazakî de ca girewt. Herçiqas hûmara nê nuştoyanê cinîyan tay bibo zî înan bi saya hikayeyanê xo, cuya cinîyan rê neynikêk tepîşt û bi saya na neynike înan cuya cinîyan ya “nîmita” û “nêasayîye” dekerd mîyanê dinyaya edebîye. Nuştoyanê cinîyan sey temsîlkarêk rolêk girewt xo ser û cuya “kênayanê xo, waye û mayanê xo” dekerd zereyê dinyaya edebî û ê temsîl kerdê. Wexto ke nê nuştoyan nê rolê temsîlkerdişî girewtê xo ser înan bi şêkilêko zelal û zît-bulit cuya cinîyan teswîr kerd. Nê nuştoxî, hemverê komelê pederşahî yo ke zafane vengê cinîyan birneno de vindertê û bîyê veng û vajê cinîyan. Înan bi saya karakteranê xo yê cinîyan problemê cîya-cîya yê cinîyan ê ke ê zereyê komelêkê pederşahî de yenê têrî teswîr kerdê û motê ra. Çike peyên de nê nuştoyanê cinîyan zî mîyanê nê komelê pederşahî de nuştoxêk ra zîyadêr sey “mayêk, kênayêk, wayêk û şorişgerêk” ca girewtêne û beno ke coka wayîrê ewnîyayîşêkê cîyayî bî û bi saya nê ewnîyayîşî û “ruhê wayîtî” înan cuya heme wayanê xo zaf hetan ra bi şêkilêko serkewte mote ra.

Karakterê cinîyê hikayeyanê Nadîre Guntaş Aldatmaze, cinîyê ke mexdûrê Terteleyê 38î yê; cinîyê “almancî”yanê ke barê heme keyeyî û domanan paştîya înan ser o yo; cinîyê ke seba domananê lajan heme emrê înan bi gedeardişî vîyareno û ancax wexto ke bibê maya domanêkê lajî mîyanê keye û komelî de qîymet vînenê; kênayê ke zewacî ra ver meseleyê “bekaretî” ruhê înan ser o barêk o; cinîyê ke mîyanê zewacî de tehda û heqaretanê mêrdeyanê xo ancenê; cinîyê ke paştdayîşê bawkanê xo nêvînenê û qedera dadîyanê xo ciwîyenê yê. Di hikayeyanê xo de zî Aldatmaze cuya cinîyanê wendeyanê ke nêwaşt qedera dadîyanê xo biciwîyê û wayîrê azadî û xoserîya ekonomîke yê mojnena ra. Labelê nê karakterê ke “wende” yê û “pere qezenc kenê” zî reyna sey dadîyanê xo nêeşkenê qayîdeyanê pergale komelê pederşahî ra bixelisîyê. Aldatmaze

seba heme karakteranê xo yê cinîyan sey “rayîrê xelasi” û netîce remayîşî ser o vindena ke zafane karakterê aye yê cinîyê ke mexdûrê qayîdeyanê komelê pederşahî yê zereyê keyeyanê xo ra remenê û ver bi ameyoxêkê nedîyarî şînê.

Hîkayeyanê Topaçê de zî reyna mîyanê komelê pederşahî de serdestîya camêrdan û bindestîya cinîyan bale ancena; nuştuxe tehda û heqaretê ke hetê mêrde û pîyanê cinîyan ra bi înan yena kerdene ser o vinderta. Labelê Topaçê bi terz û uslûbê xo yê xoser û serdestî seba qehremananê xo yê cinîyan hertim azadî, xoserî û têduştîye dima ya ke qehremanê aye hemverê nê qayîdeyanê komelê pederşahî de xo ver danê. Reyna cîyayîyêka bine ya Topaçê zî aye ya ke aye hîkayeyanê xo de bi şekilêkê azadî behsê cînselîya cinîyan kena. No mesele mîyanê edebîyatê kurdî de hetê nuştuxanê cinîyan ra zî zaf zêde nêameyo nuştene û mojnayene labelê Topaçê bi şekilêkê wêrekî behsê nê şewanê tarîyan zî kena. Qehremanê aye wayîrê hişmendîya cînselîya xo yê û cînselîya xo dima şonê wazenê na cînselîya ke parçeyêka înan ya de bêrê têrî. Çike ê mojnênê ra ke mîyanê komelî de têduştîyêka rastikêne ancax bi têduştîya cînselîye tamam bena. Cinîyî wexto ke eşkayê azadîya cînselîya xo dest finê û bedenê xo ser o wayîrê heq, qerar û vatişî bibê do tam bibê azade.

Hîkayeyanê Lorîn Demîrele de cinîyê mexdûrê meseleyanê tarîxîyan ca gênê. Demîrel meseleyê zîwan, asîmîlasyon û cinîyan ser o tehrîbatê înan mojnena ra. Seba averşîyayîş û azadîya cinîyan wendiş û karêk destfinayîş yew qayîdeyo sereke û muhîm o ke ê bieşkê cuya mayanê xo ra cîya, yew cuya newa seba xo awan bikê. Labelê pergâlê perwerdeyî seba nê karakteran hetêk ra zî kokanê xo ra durîkewtiş û asîmîlasyonî zî xo de hewêneno.

Hîkayeyanê Burçîn Bore de cinîyê ke mecbûr manenê ke welatê xo ca verdê û koçber bibê, trajedîya înan esta. Karakterê Bore zafane Almanya de ciwîyenê û seba ke zafane keyeyê înan wayîrê ewnîyayîşêkê pederşahî yê nê cinîyî û kênayî nêeşkenê adapteyê na cuya Ewropa bibê û potansîyelê xo yê averşîyayîşî bimojnê ra, coka ê kuçeyanê bajaran de vîndî benê û şonê.

Hîkayeyanê Şeyda Asmîne de zî kêna û cinîyî hemverê qayîdeyanê komelê pederşahî de, nêeşkenê xoverbidê, derheqê cuya xo de qeraran bigîrê û cuya xo awan bikê. Coka nê kênayî mecbûr manenê ke qedera mayanê xo biciwîyê. Seba ke Asmîne tayê hîkayeyanê xo de behsê cuya koyî kena yew temsîliyeto bîn yê nê karakteran esto ke ê mîyanê şerî de sey “cengawer” lej kenê û coka wayîrê hêzêkê bînî yê.

Bi saya hîkayeyanê hîkayenuştoxanê cinîyan ma hetanê cîya-cîyayan ra dekewenê mîyanê cuya cinîyan û zafane trajedî û bindestîya înan vînenê. Ma benê şahidê raywanîya înan labelê wina aseno ke seba ke na raywanîya nê karakteran biresa rayerê azadîye û xoserîye rayîrêko zaf derg hemverê înan de esto. Çike nê rayerî ser o qayîdeyê komelê pederşahî sey astengan ronaye yê.

Çimeyî

- Aldatmaz, N. G. (2013). Pîyê mi kemane cinitêne. Dîyarbekir: Roşna.
- Aldatmaz, N. G. (2014). Folklorê kirmancan ser o. Dîyarbekir: Roşna.
- Aldatmaz, N. G. (2016). Pîltane. İstanbul: Vate.
- Aldatmaz, N. G. (2016). Sanikanê mamekîye ra. Dîyarbekir: Roşna.
- Aldatmaz, N. G. (2019). Xewn. Dîyarbekir: Roşna.
- Aldatmaz, N. G. (2021). Tehlike altındaki bir dil kırmancca/zazaca. İstanbul: Vate.
- Allison, C. (2013). Folklor ve fantezi: kürt sözlü geleneğinde kadınların sunumu. S. Mojab (Dü.) içinde, Devletsiz ulusun kadınları; kürt kadını üzerine araştırmalar (F. Adsay, S. Kılıç, & E. Uşaklı, Çev., s. 245-263). İstanbul: Avesta.
- Asmîn, Ş. (2013). Zeman sey fekê kardî bî (Hîkayeyê Koyî). Dîyarbekir: Roşna.
- Aydin, S. (2014). Nadîre G. Aldatmaz reyde roportaj. Şewçîla(13), 31-37.
- Beauvoir, S. d. (1993). Kadın "ikinci cins", bağımsızlığa doğru. (B. Onaran, Çev.) İstanbul: Payel.
- Beauvoir, S. d. (1993). Kadın "ikinci cins", genç kızlık çağı. (B. Onaran, Çev.) İstanbul: Payel.
- Beauvoir, S. d. (2010). Kadın "ikinci cins", evlilik çağı. (B. Onaran, Çev.) İstanbul: Payel.
- Blank, H. (2019). Bekâretin "el değmemiş" tarihi. (E. Ergün, Çev.) İstanbul: İletişim.
- Bor, B. (2013). Hêvîya macire. Dîyarbekir: Roşna.
- Bruinessen, M. v. (2013). Adile Hanım'dan Leyla Zana'ya: kürt tarihinde siyasi liderler olarak kadınlar. S. Mojab (Dü.) içinde, Devletsiz ulusun kadınları; kürt kadını üzerine araştırmalar (F. Adsay, S. Kılıç, & E. Uşaklı, Çev., s. 131-153). İstanbul: Avesta.
- Çağlayan, H. (2013). Kürt kadınların penceresinden, resmi kimlik politikaları, milliyetçilik, barış mücadelesi. İstanbul: İletişim.
- Demîrel, L. (2014). Vîndîbîyaye. İstanbul: Vate.
- Dowling, C. (2022). Sindrella kompleksi (çağdaş kadının bağımsızlık korkusu). (S. Budak, Çev.) İstanbul: Afrika Yayınları.

- Galletti, M. (2013). Kürt toplumunda kadınların rolü üzerine batılı tasvirler. S. Mojab (Dü.) içinde, Devletsiz ulusun kadınları; kürt kadını üzerine araştırmalar (F. Adsay, S. Kılıç, & E. Uşaklı, Çev., s. 283-305). İstanbul: Avesta.
- Gilbert, S. M., & Gubar, S. (2016). Tavan arasındaki deli kadın. (N. Sakman, Çev.) İstanbul: Aylak Adam Yayınları.
- Humm, M. (2002). Feminist edebiyat eleştirisi. (G. Bakay, Dü.) İstanbul: Say.
- Millett, K. (2011). Cinsel politika. (S. Selvi, Çev.) İstanbul: Payel.
- Moran, B. (2008). Edebiyat kuramları ve eleştirisi. İstanbul: İletişim.
- Murdock, M. (2023). Kadın kahramanın yolculuğu: kadının bütünlük, iyileşme ve denge arayışı. (A.D. Yurdakul, Çev.) İstanbul: Beyaz Baykuş.
- Özkan, R. (2024). Antolojiya nivîskarên jinên kurd. İstanbul. Nûbihar.
- Topaç, B. (2012). Bero sûr. Dîyarbekir: Roşna.
- Topaç, B. (2013). Wextê heskerdişî. Dîyarbekir: Roşna.
- Topaç, B. (2020). Menewşî. İstanbul: Vate.
- Topaç, B. (2023). Binefş. İstanbul: Vate.
- Topaç, B. (2023). Sebr. İstanbul: Vate.
- Woolf, V. (2015). Kendine ait bir oda. (H. Saraç, Çev.) İstanbul: Remzi Kitabevi.
- Woolf, V. (March 1929). Women and fiction. The Forum, 81(3), 179-183.
- Yıldız, P. (2020). Kırmancca (zazaca) hikâyeciliği. S. Vali (Dü.) içinde, Yazınsal varoluştan akademik literatüre kırmancca (zazaca), M.Malmîsanij'a armağan (s. 207-245). İstanbul: Vate.
- Yildiz, P. (2021). Hikayeyê hewn û hişyarî. İstanbul: Avesta.
- Yıldız, P. (2024). Romananê Deniz Gunduzî de temaya mergî. Şarkiyat, 16(2), 1071-1092.
- Yıldızhan, V. (2021). Bîblîyografyaya kitabê hîkayeyanê kurdkî (kurmanckî- kırmanckî (zazakî) 2000-2020. Kurdiname(4), 141-161.